# HAWAR

Rojnameya Rojane

15 Gulan 2009
În
Sal: 1
Hejmar: 10
Buha: 50 Kr


## ÎRO CEJN E! HEMÛ QADÊN JIYANÊ BI KURDÎ GEŞ Û RONÎ BIKIN

# BI KURDÎ BIJÎN

**Îro roja Cejna Zimanê Kurdî ye. Gelê kurd ê li her derê dijî vê rojê dê bi coşeke mezin pîroz bike. Çalakiyên ji bo ziman dê hefteyekê bidomin. Di van çalakiyan de girîngiya parastin û pêşvebirina ziman dê derkeve pêş. Her wiha li her qadê hewcedarî bi jiyana kurdî û xwedîderketina li zimên heye**

### PARASTIN Û PÊŞVEBIRINA ZIMAN DÊ DERKEVE PÊŞ

Cejna Zimanê Kurdî ji aliyê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ve di sala 2006'an de weke cejna ziman hate îlankirin. Girîngiya vê rojê di dîroka gelê kurd de gelek e. Kovara Hawarê ku ji aliyê Celadet Elî Bedirxan ve di 15'ê gulana 1932'yan de hatiye derxistin di warê pêşvebirina zimanê kurdî de xwedî roleke girîng e. Cejna Ziman ku di salên dawî de bi girseyîtir tê pîrozkirin, dê îsal jî bi coşeke mezin bê pêşwazikirin. Di pîrozbahiyan de girîngiya parastin û pêşvebirina zimanê kurdî dê bê destnîşankirin. Her wiha fermîbûna zimanê kurdî jî wekî rojeveke sereke ya van pîrozbahiyan e.

### LI HER DERÊ BI ZIMANÊ KURDÎ BIAXIVIN

Bi wesîleya Cejna Zimanê Kurdî, Serokatiya Kongra Gel daxuyaniyek weşand û ev roja girîng û watedar di serî de li kedkarên zimanê kurdî, li hemû kurdistaniyan pîroz kir. Di daxuyaniyê de bal kişandiye ser girîngiya bikaranîna zimanê kurdî ya li her qada jiyanê û ragihandinê. Her wiha hatiye destnîşankirin ku li her dera kurd lê dijîn hewcedarî jiyana bi kurdî heye. Serokatiya Kongra Gel di dawiya daxuyaniya xwe de, bi wesîleya Cejna Zimanê Kurdî, bang li hemû kurdan kir ku li her derê bi kurdî biaxivin û hêj bêtir xwedî li zimanê xwe derkevin... RÛPEL - 6

### Zextên li ser zimanê kurdî didomin

Qedexe û astengiyên li pêşiyan kurdî bi dawî nabin. Rayedarên dewletê her çiqas bêjin tu astengî li pêşiya kurdî tune ye jî, bi awayekî fiilî kurdî tê astengkirin û qedexekirin. Siyasetmedarên kurd ji ber ku bi kurdî axivîne doz li wan tê vekirin. Di girtîgehan de qedexeyên li ser kurdî didomin. Zextên li ser çapemeniyê didomin. Rojname têne girtin û ceza dixwin... RÛPEL - 6




### Di roja ziman de danişîneke balkêş!

Baroya Amedê di sala 2008'an de ajandaya kurdî çap kir. Doz li parêzer Sezgîn Tanrikulu û Nesîp Yildirim hate vekirin. Doza danişîna îro tê dîtin. Dozger ji ber gotinên parêzer Nesîp Yildirim ku gotibû 'ez kurd im û piştgiriyê didim çapkirina vê ajandayê' vê carê jî bi 'pesindariya sûc û sûcdar' dadirizîne û daxwaza betalkirina dîplomaya parêzeriya wî kir... RÛPEL - 2

### Çalakiyên rengîn

TZPKurdî îsal Cejna Zimanê Kurdî dê bi çalakiyên cur bi cur pîroz bikin. Pîrozbahiyên ziman dê hefteyekê berdewam bikin. Her wiha fermîbûna zimanê kurdî jî wekî rojeveke sereke bê bilêvkirin. Di çarçoveya pîrozbahiyan de di navbera 15-22'yê gulanê de li gelek bajaran dê pîrozbahî bêne lidarxistin. Li gelek deveran dê ji bo şiyariya ziman belavok bên belavkirin... RÛPEL - 6

### Li Wanê ji bo çalakiyê bang

Şaxa KURDÎ DER'ê ya Wanê ji bo daxuyaniya îro li kolana Hunerê bidin bangî gelê Wanê kir. Serokê Şaxa KURDÎ DER'ê ya Wanê Levent Urun, diyar kir armanca wan a pîrozkirina Cejna Ziman ew e ku bala gelê kurd bikîşinin ser zimanê kurdî û wiha got: "Em bang li hemû welatparêz, rewşenbîr, hunermend û gelê Wanê dikin ku îro beşdarî daxuyaniya me ya çapemeniyê bibin. Em dê îro bi piştgiriya hemû saziyên kurdan ên li Wanê, bi daxuyaniyeke girseyî dest bi pîrozbahiyên Cejna Zimanê Kurdî bikin."



### Xanî û Newroz li ser sekoyê Cizîra Botan



Xwediyê gencîneya neteweyî! Roja ku biryara nivîsandina 'Destana Dehan' da, zanibû...

Arjen ARÎ 5

### Ziman... Kurdî... Cejn...



Cejna Zimanê Kurdî ku ji aliyê KNK'ê ve ji cejnên li cîhanê tên pîrozkirin cudatir e. Yanî ne weke...

Azîz OGUR 2

### Zimanê êşê an jî êşa zimanî...



Zimanê êşê tune ye; êş, bi her zimanî tûj e, dir e, dihingêve, tal e, diêşîne... Zimanê êşê...

Omer DILSOZ 6

### Şêx Maşûq: Tu kes mafan bi xêra xwe nade

Şêx Maşûqê Xiznewî di salvegera yekemîn a Ferhadê şehîd û şehîdên serhildana 12'ê adarê de axaftinek kiribû. Şêx Maşûqê Xiznewî wê demê wiha gotibû: " Birano! Tu kes mafan bi xêra xwe nade, mirov mafên xwe bi darê zorê distînin. Pêwîst e dilopên xwîna wan şehîdan şitlên mafên we av bidin, ji îro û pê ve em nahêlin hûn şehîdên xwe ji bîr bikin... Em hevbeşên rijandina xwîna we ne, çunkî em serdemeke pir dirêj di xew de man, em giş hevbeşên xwîna te ne, me gişan tu radestî wan kirî, me gişan tu xapandî, me hûn xapandin, me rojekê lê nepirsî, me ji celadên we nepirsî, me doza xwîna we nekir... RÛPEL - 2



### 'Divê gavên pratîk bêne avêtin'

**BERTEK** û nîqaşên erênî yên li ser gotina Serokomar Abdullah Gul a wekî, "Pirsgirêka kurd pirsgirêka Tirkiyeyê ya sereke ye û divê çareser bibe. Ji bo çareseriyê bingeha musaîd heye" didomin. Rêveberên partiyên siyasî, nûnerên saziyên sivîl û hiqûqnasan gotinên Serokomar Abdullah Gul nirxandin û destnîşan kirin ku çareseriya ji bo pirsgirêkê kurd rast hatiye kirin û divê êdî gavên bawerîdayînê bidin gel. Hate ragihandin ku pirsgirêk bi rêbazên leşkerî nayê çareserkirin... RÛPEL - 4



### Cerdevaniyê bi xwe re êş û jan aniye

**PIŞTÎ** komkujiya cerdevanan a li Mêrdînê pergala ku bûye sedema bi sedan kuştin, girtin, koçberkirin, şewitandina gundan bi gelek bûyerên din tê nîqaşkirin. Beşek kesên ji cerdevahiyê bandoreke mezin girtî niştecihên bajaroka Ertûşa navçeya Çelê ye. Jinên hevserên xwe di dema cerdevaniyê de, di encama şerî de hatin kuştin û bi mecbûrî koçî Wanê bûne, destnîşan kirin ku cerdevaniyê ji bilî êşan tiştek nedaye wan, ji bo wan cerdevanî tê wateya mirin û kuştinê... RÛPEL - 7

### Li Mêrsînê greva girseyî dest pê kir

**RÊXISTINA** DTP'ê ya Mêrsînê bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser partiyê greva birçîbûnê ya 2 rojan bi beşdariya 500 kesî hate destpêkirin. SDP, ESP, YDG-M, SEH, DÎP, DHF, Partîzan, Halkevlerî, ÎHD, Goç-Der, hewldanên 68 û 78'yan, DOKH, MKM-DER, OZYURT-DER jî piştgirî dan çalakiya li 4 konên li ber DTP'a Akdenîzê hatiye vekirin, didome. Serokê DTP'a Mêrsînê Ramazan Ekîncî ku daxuyanî da, diyar kir ku Tirkiye di pêvajoyeke hesas re derbas dibe û wiha got "Ev pêşketinên dawî ji aliyekî ve hêviyên me yên ji bo aştiyê mezin dike û ji aliyê din ve jî fikaran zêde dike.'... RÛPEL - 4

# Kurdî di Cejna Zimanê Kurdî de tê darizandin

**I Çetîn ALTÛN** - AMED

**Di roja Cejna Kurdî de danişîneke balkêş. Parêzer Sezgîn Tanrikulu û Nesîp Yildirim ji ber ku biryara çapkirina ajandaya kurdî dane, dozger daxwaza betalkirina dîplomaya parêzeriyê kir. Parêzer li vê biryara xwe xwedî derketin, lê vê carê bi 'pesindariya sûc û sûcdar' têne darizandin**

Di doza ajandayê de sosretiyeke nû derket holê. Dozger ji ber gotinên parêzer Nesîp Yildirim ku gotibû 'ez kurd im û piştgiriyê didim weşandina vê ajandayê' vê carê jî bi 'pesindariya sûc û sûcdar' hat darizandin û daxwaza ji bo betalkirina dîplomaya parêzeriya wî kir.

Parêzer Nesîp Yildirim berê li gorî Qanûna Cezayê ya Tirk 257'an 'xelet bikaranîna erka xwe' hat darizandin û di dozgeriyê de got ez jî kurd im û biryara kurdî derxistina ajandaya kurdî rast dibînim û vê carê jî ji aliyê dozger ve li gorî zagona 215'an ango 'pesindayîna sûc û sûcdar' doz lê vebû. Dozger bi vê yekê jî têr nebûye û îdianameya xwe de xwest ku dîplomayên parêzeran jî bê betalkirin.



Baroya Amedê ji ber ku di sala 2008'an de ajandaya kurdî derxist doz li serokê Baroyê yê kevn Sezgîn Tanrikulu û parêzer Nesîp Yildirim vebû. Nesîp Yildirim her çiqas di rêveberiya Baroyê de cih negire jî ji ber ku di wêneyekî de bi Tanrikulu re rûniştiye doz lê hatiye vekirin. 15'ê gulanê roja Cejna Zimanê Kurdî ye û Tanrikulu û Yildirim careke din dê derkevin pêşberî dadger. Ger Tanrikulu û Yildirim sûcdar bên dîtin dê peywira parêzeriyê ji destê wan bê girtin û nikarin di tu saziyeke sivîl û partiyekê de cih bigirin.

**'Doz bi çewtî didome'**

Serokê Şaxa MAZLUMDER'a Amedê parêzer Selahattîn Çoban anî ziman ku doza ajandayê bi çewtî dest pê kiriye û bi çewtî didome. Çoban diyar kir ku sedema doza vekirina der barê Nesîp Yildirim de ji ber ku wî û Sezgîn Tanrikulu di heman wêneyî de cih girtine vebûye û der barê dozê wiha pê de çû: "Nesîp Yildirim li gorî Qanûna Cezayê ya Tirk ya 257'an 'xelet bikaranîna erka xwe' tê darizandin. Nesîp Yildirim di mehkemeya yekem de di îfadeya xwe de got, 'Ez jî kurd im. Kurdî zimanê min ê zikmakî ye, ez wê tevgera baroyê rast dibînim'. Îcar vê carê jî li gorî zagona 215'an ya 'pesindayîna sûc û sûcdar' hat darizandin."

**Di roja cejnê de tê darizandin**

Li hemberî gavavêtinên 'qaşo' yên wekî vekirina televîzyona kurdî, di zanîngehan de vekirina beşên kurdî nakokî û sosretiya dewletê ew e ku zimanê kurdî di Roja Cejna Zimanê Kurdî de careke din dadirizîne. Selahattîn Çoban der barê roja dozê de wiha axivî: "Pergal bi vê dozê zimanê kurdî didarizîne, zimanê kurdî tê darizandin. Ji aliyekî ve qaşo gavan diavêjin. Balkêş e di roja Cejna Zimanê Kurdî de çend kurd ji ber ku bi zimanê xwe yê zikmakî ajanda derxistine tên darizandin. Ez bawer nakim li tu dera cîhanê sosretiyeke wiha hebe. Li herêmê îktîdar û hikûmet çi dikin ji aliyekî ve kanala kurdî vedikin ji aliyê din ve dibêjin kesên wek me nebin, nejîn, nefikirin bila vî karî nekin."

Parêzer Çoban gotinên Serokê Baroya Amedê Emîn Aktar ên der barê dozê de bîrxistin û wiha got: "Serokê Baroya Amedê Emîn Aktar ji bo dozê got ku dema dozger der barê dozê de mutaala da min xwe di salên 1930'î yên Almanyayê de hîs kir. Zîhniyeta faşîzmê li ser kar e. Min xwe wisa hîs kir."

**'Em jî sûcdar in'**

Parêzer Çoban anî ziman ku ji bo doza pêncşemê dê roja înê careke din xwe gilî bikin ku piştgiriyê bidin biryara kurdî derxistina ajandayê û hevalên xwe. Çoban der barê mijarê de wiha got: "Di rûniştina din de jî me xwe îxbar kir em ê di vê rûniştinê de jî xwe îxbar bikin em ê bêjin derxistina ajandaya kurdî sûc be em jî wî sûcî dikin. Me jî bixin nava wê dozê. Ger ev sûc be em jî hevkarê wî sûcî ne. Em piştgiriya ajandaya xwe dikin. Em baro, heval û zimanê xwe xwedî derdikevin."

Çoban di berdewama gotinên xwe de diyar kir ku ew ê li kurdî xwedî derkevin û wiha pê de çû: "Ew çi bikin em ê wî zimanî biaxivin, binivîsin ev ziman hebûna me ye. Em dev ji zimanê xwe bernadin. Ew çi zext û zordariyê dikin bila bikin, parêzeriya me jî ji destê me bigirin em dev ji ziman ango hebûna xwe bernadin."

# Tu kes mafan bi xêra xwe nade

**ŞÊX MAŞÛQÊ XIZNEWÎ**

*Gotina Şêx Maşûqê Xiznewî ya di salvegera yekemîn a Ferhadê şehîd û şehîdên serhildana 12'ê adarê de...*

"Bi navê Xwedayê pak ê dilovan
Birayên hêja
Delalno!

Hûn giş dizanin ku tu rojan ez beşdarî şînên mirinê nebûme, yên nêzî min jî baş dizanin ku ez beşdarî salvegera koçkirina bavê xwe nabim. Berevajî hinek kesan, ger em mirinê wernegerînin û nekin jiyan, tu hewcedariya min bi şînîkêşanê û bi ahengên mirinê nîn e.

Ez îro di nav we de me, ne ji bo salvegera Ferhadî- salvegera mirin û şîniya wî, lê ez bi we re me ji bo salvegera jiyana wî û salavegera jiyana gel û neteweya wî. Ez pir kêfxweş im ku niha bi we re şahiya jiyana vî mirovî li dar dixim, lê ji hêleke din ve xemgîn im çunkî salek di ser şehîdên serîhildanê re derbas dibe bêyî ku neteweya wan şahiya jiyana wan li dar bixîne.

Ferhad delalê ber dilê me gişan e, delal e, vê gotinê piştî rêzgirtina hestên dê û bavê wî, jin û keça wî, dibêjim.

Ferhad li ber dilê me gişan şêrîn e, lê kê gotiye ku hemû şehîdên serîhildanê ne wekî Ferhad şêrîn û payebilind in?

Çima bîranîna wan derbas bû û hûn bêdeng bûn, di xewê de bûn, kê hûn xistine xewê, kê wisa xistiye serê we de ku miriyên wekî min û we nikarin bijîn û jiyanê bidestxînin!?

Birano!

Tu kes mafan bi xêra xwe nade, mirov mafên xwe bi darê zorê distînin.

Pêwîst e dilopên xwîna wan şehîdan şitlên mafên we av bidin, ji îro û pê ve em nema dihêlin hûn şehîdên xwe ji bîr bikin. Lewra Şiî ne şaş in ku her sal der barê kuştina Huseynî dipeyivin, Huseynê ku berî hezar û çarsed salan şehîd ketibû, hê jî neteweya wî ahenga xwîna wî li dar dixe, ne ji ber ku zilamekî wan miriye, lê belê dixwazin bi vê yekê, bi xwîna wî, alîgir û netewe û şiîyên wî av bidin û zindî bihêlin.

Reng e ez bi hûrbînî baş tênegihêjim ka çi bi Ferhad kirin?

Ez yek ji wan kesan im, pir ji şiv û qamçiyên lêdanê ditirsim, naxwazim wan bi bîrbînim, lê ji kêlîka ku bavê Ferhad ez vexwendî vê bîranînê kirime, nizanim çima Yasir û Sumeyayê hatine bîra min: Yasirê pir hêja hevalbendê pêxember, serbir û celadên wî jê re digotin em ê her tiştî bi te din, hemû tiştên ku tu bixwazî, em ê te azad bikin, bi tenê dijûnan û çêrî Muhemed bike. Yasir û Sumeyayê bi ya wan nekirin û Sumeyayê tif li rûyê Ebî Cehel kir.

Ji Ferhad jî xwestin ku dijûnan bibêje û çêrî xelkên xwe, gelê xwe û neteweya xwe bike, lê nizanim ka Ferhadî tifî rûyê wan kir an na?

Di rastiyê de yê ku ji mirovan bixwaze ku çêrî xelkên xwe bike pêwîst e mirov tifî rûyê wan bike.

Lêborîna xwe ji we dixwazim, ez ê hinekî gotina xwe dirêj bikim, ez bawer im ji nav oldaran niha li vir ez ê bi tenê bipeyivim:

Ferhad!

Min çend gotin nivîsandine, ez ne helbestvan im, lê Ferhad! ez niha, di te de, êşên xwe û êşên gel û neteweya xwe dibînim û hest dikim.

Tu hemû ciwanên me yî.

Hemû jinên me li pey te reşgirêdayî ne

Damar û rehên zilamên me bi êş û xwînê diteqin.

Lê yan bila zilamên me wekî te bimirin an jî bila ne zilam bin.

Neteweyeke mirî zilamek wê zindî dike, neteweya ku bi mirinê diheste, hewcedarî mirovekî bû ku jê re bibêje rabe!!!

Îcar çawan tu ey Ferhad!!?

Min dixwest te bînim bîra xwe ka tu kî yî??

Ma gengaz e ku niha li salvegera mirovekî me û wî nas nakim?

Tu kî yî?

Min dixwest sîma û rûyê te bînim ber çavên xwe, lê nikarim!

Her ku rûyê te tînim bîra xwe hawara te ya di bin dar û qamçiyên lêdanê de dibihîzim.

Her ku dixwazim wêneya te di hişê xwe de bigewde û nîgar bikim; şirqîna pêlên elektrîkî yên ku di laşê te yê tenik de dengvedidan dibihîzim.

Her ku dixwazim dengê te bibihîzim tu tişt ji bilî hawar û qêrînên te nakevin bîra min…

Gelo dema ku dibêjim hawar û qêrînên te, tu bi vê yekê naêşî?

Yên wekî te ne dinalin û ne jî diqîrin.

Wekî çiyan di rûyên celadên xwe de radibin ser piyan.

Lê Ferhad tu û hevalên xwe yên şehîdên vê neteweyê rê bidin min da ji we re bibêjim:

Em giş,
Ez û hûn,
Û hemû miletê te jî hey Ferhad!
Em hevbeşên xwîna te ne,
Em hevbeşên rijandina xwîna we ne, çunkî em serdemeke pir dirêj di xew de man, em giş hevbeşên xwîna te ne, me gişan tu radestî wan kirî, me gişan tu xapandî, me we xapand, me rojekê li we nepirsî, me ji celadên we nepirsî, me doza xwîna we nekir.

Pir hêsan e ku fermanên azadkirina girtiyên girtîxaneyan derkevin, lê fermanên hemû dinyayê nikarin xwîna Ferhad û şehîdên serîhildanê li me vegerînin.

Bi tenê fermana we dikare gelî birayan.

Ger hûn biryara jiyanê werbigirin û hewl bidin li ser zemîneke tund rawestin û doza mafê xwe yê mirovane bikin.

Fermana we jiyana wan kesan vedigerîne, dema hûn biryarê bidin ku hûn mirov in.

Ferhad!

Hey gelê Ferhad!

Ez dizanim ku serkeftin nêzîk e, lê em giş bi hêvî ne ku em nemirin, hetanî ku lawaztirîn mirov di nav me de li ser gora te raweste û bibêje ha va ez şehîdên xwe zindî dikim û em jî bi wan zindî dibin.

Lêborîna xwe ji diya te dixwazim Ferhad û dibêjim:

Ger melekê mirinê ji min bipirse ma tu dixwazî hinekan bikî bi qurbana Ferhad î?

Reng e nîvê miletê te bibe bi qurbana te, çinkî bê deng û razayî ye..

Ez dibêjim îro, me biryara xwe daye em wan kesên ku we ew kuştin zindî bikin, me biryara xwe daye ku em wêran û kavilên ku we ji me re hiştine ava bikin, me biryar daye ku Ferhad û hevalên xwe dê tovên me yên geşkirin û ronîkirina jiyanê bin."

***Têbinî:*** *Ferhad Mihemed Elî Sebrî xortekî kurd ji Qamişloyê bû. Di serîhildana 12'ê adara 2004'an de ji hêla hêzên ewlekariyê yên Sûriyeyê ve hate girtin. Piştî çend rojan ji girtina wî, di bin îşkenceyê de şehîd bû. Ev gotina Şêx Maşûqê Xiznewî di salvegera şehîdbûna wî de hate xwendin.*

***Werger ji erebî: Ehmedê Huseynî***



**Beroj**

**Azîz Ogur**
*abdulazizogur@hotmail.com*

## Ziman... Kurdî... Cejn...

ZIMAN: Rêbaza ravekirin, ragihandina raman, hest û ajoyan a rasterast an endirekt e. Ji bo jihevfêmkirina mirovan, ji bo xweîfadekirinê, amûra tê bikaranîn, ziman e. Hemû deng û danîşanên ji bo ragihandina raman û hestan, tev di çarçoveya ziman de tên nirxandin. Ziman amûra bi tenê ya bingehîn-bibandor a ramanê ye. Di tunebûn an xerabûna vê amûrê (ziman) de, nikare behsa ramaneke saxlem were kirin. Tunebûn an xerabûna ziman tê wateya tunebûna ramanê yan ramaneke têkçûyî. Her wiha beyî tunebûna zimanê neteweyî, nikare behsa hebûna neteweyê jî were kirin. Heger zimanê neteweyî nebe perwerde, hilberîn, bikarênerî, parvekirin jî pêk naye; li dewsa wan tevlihevî, parçebûn, jihevbelavbûn, dejenerebûn pêk tê.

KURDÎ: Zimanê kurdî, zimanek ji şaxa zimanên Îranî yê bakur rojavayê zimanmalbata Hind û Ewropî ye. Piraniya gelê li Kurdistanê bi vî zimanî diaxivin û zimanê dayikê yê piraniya kurdan ev ziman e. Çend zaravayên kurdî hene. Kurmancî li bakur, başûr, rojhilat û rojavayê Kurdistanê, soranî li başûr û rojhilat tê bikaranîn. Kurmancî bi piranî bi tîpên latînî tê nivîsîn û soranî bi tîpên erebî. Zaravayên din kirmanckî, hewramî, lekî, kelhurî û feylî ne. Ji ber mêtîngerî, înkar û asîmîlasyonê li Tirkiye, Îran û Sûriyeyê hêj kurdî mîna zimanekî qedexe ye. Li Iraqê tevî kurdî bi fermî hatiye qebûlkirin jî mixabin li başûrê Kurdistanê şêwazê siyaseta serdestan zext, cudakarî û qedexe li ser zaravayê kurmancî heye.

CEJN: Têkildarî roj an bûyerên girîng, tevahiya pîrozbahiyên tên kirin mîna cejn tên binavkirin. Cejn mîna adetên ku ji aliyê gel, netewe an tevahiya kesên di nava beşên berfireh ên civakê de hatine qebûlkirin in. Hemû cejnên li cîhanê tên pîrozkirin ji bîranîneke kûr ya civakê yên olî, neteweyî an baweriyeke cuda tên.

CEJNA ZIMANÊ KURDÎ: Li gorî bîr û baweriya min, têkiliya tevahiya pirsgirêkên siyasî, civakî, psîkolojîk û heta aborî yên gelê kurd bi wan re rû bi rû ye, bi qedexe, asîmilasyon û otoasîmilasyonê re heye. Bi zimanê desthilatdaran meşandina têkoşînê û neafirandina edebiyat û zimanê şoreşê yê xurt ê kurdî, pirsgirêka herî mezin e li pêşiya me. Mîna paradokseke mezin e; lê tevî vê aliyê xwe yê kêm jî dîsa di encama vê têkoşîna hate dayin de, rê li tunebûn, ji holêrakirina ziman û çanda kurdî hate girtin.

Hewldanên Rêberê Gelê Kurd Rêzdar Abdullah Ocalan ê ji bo ziman û çanda kurdî; sazî û dezgehên hatin avakirin tev ji bo afirandina neteweyeke demokratîk e.

Cejna Zimanê Kurdî ku ji aliyê KNK'ê ji cejnên li cîhanê tên pîrozkirin cudatir e. Yanî ji yadkirina rojeke girîng, bûyereke taybet a bûye bîranîna hevpar a gelê kurd wêdetir, hewldana afirandina roj, bûyer an bîranînekê (cejnekê) ye. Hewldana xwedîderketin, pêşxistina zimanê kurdî ye. Bêguman nayê wateya bîranîn an hewldanên çend rojan ên ji bo zimanê kurdî. Heger ev pêvajoya cejnê mîna platforma muhasebeya asta xwedîderketina zimanê kurdî werê nirxandin dikare bigihêje armanca xwe. Ji bo vê yekê jî divê zimanê kurdî ji meraq, dilsoziyeke manewî û hewldana komeke entellektuelên kurd wêdetir bibe pêwîstiyeke hemû qadên jiyanê. Di vir de roleke bingehîn di serî de rêveberiyên herêmî û siyaseta kurd dikeve ser milê hemû sazî, dezgeh û takekesên kurd. A girîng ew e ku cejna zimanê kurdî bibe wesîle û derfeta biryarbûna di her qada jiyanê de bikaranîn û pêşxistina zimanê kurdî. Bi hêviya rojên ku Cejna Zimanê Kurdî li dewsa fikarên têkçûna kurdî û bilêvkirina êşên ji ber asîmilasyon û otoasîmilasyonê; wergere rojên şahiyê yên jiyaneke azad a kurdewar.

Cejna Ziman li tevahiya gelê kurd pîroz be...

**HAWAR**
**Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.**
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
**Bedri ADANIR**
***Adres:*** Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
***TEL:*** 0 (412) 229 00 30
***Fax:*** 0 (412) 229 00 39

Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
***Tel:*** 0 (212) 580 63 80
***Edene:*** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. ***No:*** 44 Seyhan Edene
**Yayın Türü:** Süreli

# Cenaze li çolê hiştin

**Dozgerê Komarê yê Êlihê roja 12'ê gulanê bê ku destûr bide rojnameger û baroya Êlihê çû çiyayê Helkîsê û hestiyên ji gorên tomarî derketin bi awayekî bêserober kir tûr û bo ku testa DNA bê kirin şandin Amedê**



Gundiyên der barê hestiyên li çiyayê Helkîsê yê navçeya Hezoyê hatîn peydakirin de agahî dan, diyar kirin ku di navbera salên 1993-96'an de 45 endamên PKK'ê jiyana xwe ji dest dane û cesedên wan li çolê hatine hiştin. Dozgeriya Komarê ya Êlihê jî hestiyên di encama lêkolîna 2 rojan de berhev kirîn, şandin Saziya Tipa Edlî ya Amedê.

Piştî gotegotên der barê hestiyên endamên PKK'ê yên li çiyayê Helkîsê yê navçeya Hezoya Êlihê, Dozgeriya Komarê ya Êlihê 2 rojan li herêmê lêkolîn kir. Hestiyên hatîn peydakirin ji bo testa DNA'yê şandin Saziya Tipa Edlî ya Amedê. Gundiyên li herêmê diyar kirin ku di navbera salên 1993-96'an de di encama pevçûnên li herêmê derketîn de yek jê jin 45 endamên PKK'ê jiyana xwe ji dest dane. Gundiyan diyar kir ku di encama pevçûnan de di sala 1993'yan de 10, 1995'an de 15, 1994'an de 12 û di 1996'an de 8 PKK'yiyan jiyana xwe ji dest dane.

**'Cenaze hilnedan li erdê hiştin'**

Gundiyan diyar kir ku li çar deverên Çiyayê Helkîsê hestiyên aîdî PKK'yiyan hatin peydakirin û wiha gotin: "Hestî li çolê hiştine. Ji ber ku herêm mîna, 'Herêma ewlehiyê' îlan kirin, kesê nekarî biçe cenazeyan bîne. Cenaze wisa li holê hiştin. Dema gundî havînê derdikevin çiya hestiyan li holê dibînin. Belavî wan deran bûne. Cil û berg û solên aîdî PKK'yiyan hene. Kinc riziyane û şopên guleyan li ser hene."

**Şer hefteyekê dewam kiribû**

Gundiyên bal kişand ser pevçûna di sala 1994'an de li çiyayê Helkîsê pêk hatî û wiha axivîn: "Operasyoneke mezin pêk hat. Ji saetên sibê de 4 aliyên çiya hatin dorpêçkirin. Pevçûnan heta saet 16.00'an berdewam kirin. Li gorî texmînan 50 şervan li wir hebûne. Di encama pevçûnê de 12 PKK'iyan jiyana xwe ji dest dabû. 38 jî paşve vekişiyabûn. Meha hezîranê bû û pevçûnan hefteyekê berdewam kir.

**Birê Wedad Aydin jî di nav de ye**

Di encama pevçûnê de Birê Serokê Rêxistina HEP'ê yê demê Vedat Aydin ê bi navê Salîh Aydin (Vedat), Veysel Korkmaz (Kuçuk Agît), Orhan Erdem (Azad), Ayhan Oner, Dogan ê ji Colemêrgê, Baz ê ji Sûriyeyê, Sozdar a ji Êlihê, Rojîn, Sîpon ê ji Sasonê, Xwîn reş ê ji Sinermegiya Sasonê jiyana xwe ji dest dabûn. Dogan birîndar hatibû girtin lê piştre hate înfazkirin. Hestiyên PKK'yiyan ev 15 sal e li cihên cuda yên çiya an jî di şikeftan de dimînin. Piştî pevçûnan cenaze hatine parçekirin. Ji ber ku hestî şikestîne û belav bûne. Hestiyê serê hinekan tune ye. Hinekan milên wan tune ye. Hind jî bi komî hatine veşartin. Ji bilî van em dizanin di nav van salan de 45 PKK'yiyan jiyana xwe ji dest dane."

**Dozger jî bêrêz nêzî cenaze bû**

Li ser derketina hestiyên li Çiyayê Helkîsê Baroya Êlihê, ÎHD û MAZLUMDER ketin nav hewldanê. Baroya Êlihê ku xwest li herêmê lêkolînan bike serî li Dozgeriya Komarê ya Êlihê da. Bes daxwaza Baroya Êlihê hate redkirin. Dozgeriya Komarê ya Hezoyê di 12'ê gulanê de li herêmê lêkolîn kir. Di lêkolînên destûr nehat dayîn rojnameger dîmenan bigirin de gelek hestî hatin peydakirin. Hestî ji bo lêkolînan şandin Saziya Tipa Edlî ya Amedê. Têkildarî hesiyan heta niha 4 malbatan serî li Şaxa ÎHD'ê ya Êlihê dan. Serokê Komeleyê Osman Kunteş diyar kir ku ew ê serlêdanên pêwist bikin. **ÊLIH / DÎHA**

## Li Dîwaniyê cesedê 100 kurdan hat dîtin

Li Dîwaniyê ya navenda Iraqê goreke tomarî hat dîtin. Di gorê de 100 cesed hene û hat gotin ku ev cesed ên kurdên ku di sala 1991'an de hatine qetilkirin in.

Gora tomarî li nêzî bojarê Dîwaniyeya Iraqê hat dîtin. Rayedaran da zanîn ku ceset ên kurdên serhildêrên sala 1991'an in. Hat tespîtkirin ku gule ji nêz ve bera cenazeyan dane û ligel mêran hejmara jin û zarokan jî zêdeye.

Amerîkayê bêdeng temaşe kir

Di pêvajoya şerê Kendavê ya sala 1991'an de kurdan li hemberî rejîma Sedam Huseyîn dest bi serhildanê kir. Piştî ku artêşa Iraqê ji Kuweytê vekişiya li hember kurdan dest bi tevkujiyê kir. Di wê demê de Amerîka jî bêdeng ma û kurd bi çekên kîmyewî qetil kirin.

300 hezar ceset hatin dîtin

Piştî Sedam bi sedan gorên tomarî yên dema tevkujiya Enfalê hatin dîtin. Li Mûsilê 15 gorên tomarî ên jin û zarokan hene. Di gorên tomarî de ya herî mezin a Hîllayê bû û di wê de 2 hezar cesed hebûn. Piştî ku Amerîkayê di meha adara sala 2003'yan de Iraq dagir kir û şûn ve ji 300'î zêdetir gorên tomarî hatin dîtin û di wan goran de 300 hezar cesed derketin.

Sedam hat bidarvekirin

Sedam di sala 1980'an de li hemberî kurdan dest bi tevkujiya Enfalê kir û 180 hezar kes hatin kuştin. Li Helepçeyê, bi çekên kîmyewî 5 hezar kurd hatin qetilkirin. Piştî rejîma Sedam berpirsên tevkujiyê derketin rûberî dadgehê û hatin darizandin. Sedam hat bidarvekirin. Lê hê jî doz didome. SILÊMANÎ / ANF

## Operasyonên li dijî DTP'ê didomin

Piştî operasyona 14'ê nîsanê ku li hemberî DTP'ê dest pê kiribû bi sedan endamên DTP'ê hatin girtin bê ku navber bikevê didomin. Li gorî agahiyên ku hatin bidestxistin li Amed, Enqere, Aydin, Êlih, Colemêrg û gelek bajarên din operasyon pêk hatin û gelek endamên DTP'ê hatin girtin.

**AMED:** Li Amedê cardin operasyona binçavkirinê dest pê kir. Li ser destûra lêgerîna giştî hate zanîn ku heta niha gelek kes hatin binçavkirin. Li Amedê serdagirtinên malan û binçavkirinan dest pê kir. Hate zanîn ku dadgehê ji bo 2 rojan destûra lêgerînê û binçavkirinê daye polîsan. Li ser vê yekê li navçeyên Baglar û Sûrê gelek lêgerîn pêk hatin. Hate zanîn ku heta niha di encama serdagirtinên malan û kargehan de gelek kes hatin binçavkirin.

**ÊLIH:** Yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Êlihê di saetên serê sibê de bi ser gelek malan de girt. Di encama serdagirtinan de Mehmet Abayay, Mustafa Çelîk, Zeynep Turgut û Nîhat Zeroglu hatin binçavkirin. Sedema binçavkirinan nehate zanîn. Ji kesên hatin binçavkirin Zeroglu bi hinceta dozeke wî ya li Amedê heye şandin bajar û 3 kesên din li Midûriyeta Polîsan tên girtin

**SILOPÎ:** Li Silopiya Şirnexê, endamê Meclîsa Ciwanên Welatparêz û Demokratîk (YDG-M) Metîn Çetîn, li Lîseya Anadolu dema di dersê de bû ji aliyê polîsan ve hate binçavkirin. Xwendekarên lîseyê ku li hemberî vê yekê nerazîbûn nîşan dan, ders boykot kirin. Li Silopiyê di encama serdagirtinên malan de jî 4 kes hatin binçavkirin.

**AYDIN:** Li Aydinê bi hinceta ku 'propagandaya rêxistinê kirine' 6 kesên bi navê Suleyman û Sefter Guzel, Cengiz Unutur, Murat Taşdemîr, Huseyin Hantirak û kesekî ku navê wî nehat hînbûn hatin girtin û ew birin girtîgeha tîpa E Tîpa ya Aydinê. Bi van girtiyan ve li Aydinê hejmara girtiyên DTP'î bû 25.

**KONYA:** Yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Konyayê pêr di saetên sibê de bi ser gelek malan û rêxistina DTP'ê ya Konyayê de girtibû. Seroka Rêxistina DTP'ê ya bajar Ayfer Almaz û endamên YDG-M'yê jî di nav de 20 kes hatibûn binçavkirin. Lêpirsîna wan a li midûriyeta polîsan didome. Lê Kayahan Tanriverdî ji ber ku leşker bûye sewqî şaxa leşkeriyê kirine û jina bi navê Muzeyyen piştî îfadedayînê serbest hate berdan. Piştî serdagirtina Rêxistina DTP'ê li hemberî avahiyê pankarta, "An hez bike an terk bike" hatibû daliqandin. **AMED**

## Roket bi mala polîsan ve dan

**COLEMÊRG**

Li avahiya Midûriyeta Polîsan a Colemêrgê êrîşa bi roket pêk hat. Guleya roketê ku li qata 4'emîn a avahiyê ket, rê li ber xisarê vekir. Piştî êrîşê li herêmê operasyon hate destpêkirin. Li gorî agahiyan, şevê din seat 00.20'an de avahiya Midûriyeta Polîsan a Colemêrgê ya li ser riya Taxa Daggoliyê, rastî êrîşa bi roketê hat. Guleya roketê li qata 4'emîn a avahiyê ket. Di êrîşa bûyî sedema xisarek mezin de, mirî an jî birîndarî çênebûn. Piştî êrîşê li bajêr guleyên ronîkirinê hatin avêtin û li herêmê operasyon hate destpêkirin.

## Dosyayeke din a kiryar nediyar hat girtin

Dosyaya M. Zekî Yilmaz ku di sala 1994'an de li navçeya Gevera Colemêrgê bi şiklekî kiryar nediyar hate kuştin piştî 15 salan hate girtin. Birayê Yilmaz Reşît Yilmaz ku li hemberî biryarê nerazîbûn nîşan da, diyar kir ku dê dozê bibin DMME'yê.

M. Zekî Yilmaz ku li navçeya Gevera Colemêrgê bi bazirganiyê re mijûl dibû, di 15'ê adara sala 1994'an de hate binçavkirin. Yilmaz piştî rojekê di binçavan de ma hate berdan. Yilmaz ku li midûriyeta ewlehiyê hate berdan di 23'yê adara sala 1994'an de ji nişkê ve winda bû. Di 25'ê adarê de jî cenazeyê Yilmaz ku îşkence û 60 guleyan hatî kuştin li qiraxa riya gundê Manîs ku 20 kîlometreyan dûrî navçeyê ye hate dîtin. Lê piştî 15 salan bi hinceta dem di ser de derbas bûye dosya hate girtin.

**'Dewlet kiryaran dernaxe holê'**

Birayê Yilmaz Reşît Yilmaz, diyar kir ku wî ji dozger re got: "Birê min ji aliyê kontrgerîla ve hatiye revandin. Wî got rêxistineke wiha tune û ez ji oda xwe kirim derê. Lê roja 25'ê adarê cenazeyê birayê min hate dîtin. Li ser laşê wî şopên îşkenceyê hebûn. Dest û lingên wî girêdabûn û cihê 60 guleyan di cenaze de hebû." Yilmaz, derbirî ku dê dosyayê bibin Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê.

**Dosyayên wisa bi qestî digirin**

Parêzerê Yilmaz Nevzat Anuk destnîşan kir ku dosyayên wisan bi qestî tên girtin. Anuk diyar kir ku ew dê li Dadgeha Îdarî ya Colemêrgê îtîraz bikin.

**Em dê dosyayê bişopînin**

Parlamenterê DTP'ê yê Colemêrgê Hamît Geylanî jî, daxuyand ku li Colemêrgê gelek dosyayên wekî ya Zekî Yilmaz hatine girtin hene û bilêv kir ku dema kurd mijara gotinê bin zagon her tim bi awayekî cuda tên pêkanîn. Geylanî, derbirî ku dosyayên wiha li herêmê di nav dilan de birîneke bi xwîn e. **COLEMÊRG**

## Li Şemzînanê 3 kes hatin binçavkirin

**COLEMÊRG**

Leşkerên bi ser gundê Helanê yê Şemzînanê de girt 3 kes girtin binçavan. Hate angaştin ku leşkeran gefa kuştinê li şivanekî xwariye. Gundê Helanê piştî dorpêçkirina 2 rojan duh rastî serdagirtinê hat. Di lêgerînan de bi hinceta qaçax e mazota ku li malan jî hate desteserkirin. Hate zanîn ku muxtarê berê Mehmet Halîk Akbaş û Îzzettîn Înan û Muhyettîn Elmas hatin binçavkirin.

## Li girtîgeha Kiriklarê çalakî didome

Girtî û hikumxwarên li 2'yemîn Hejmara Girtîgeha Tîpa F a Kiriklarê li hemberî pêkanîn û cezayên disîplînê yên keyfî, astengkirina danûstandina bi kurdî, kêmkirina mafê sohbetê û binpêkirina mafan biryara çalakiyan girt. Girtiyan diyar kir ku dê rojê 3 caran bi armanca protestoyê li mazgalan bixin, xwestin ji bo lêkolînê heyet ÎHD'ê biçe girtîgehê.

Girtî û hikumxwarên li 2'yemîn Hejmara Girtîgeha Tîpa F a Kiriklarê bi riya malbatên xwe daxuyandin ku di pêvajoya dawiyê de rastî pêkanînên keyfî tên û ji mafên xwe yên bingehîn jî tên mehrûmkirin. Girtiyan daxuyand ku rastî pêkanînên cezayên disîplînê yên keyfî, astengkirina danûstandina kurdî, mafê kêmkirina sohbetê jî di nav de binpêkirina gelek mafan tê jiyîn. Hate destnîşankirin ku girtî û hikumxwaran li hemberî pêkanînên kêfî û binpêkirina mafan biryara girtine ku her roj saet di 10:30, 13:30 û 15.30'an de nîv saetê li mazgalên hesin bixin û çalakiya "deng" li dar bixin. Girtan diyar kirin ku heta daxwazên wan bi cih neyên, dawî li çalakiya deng naynin. Girtiyan xwest ku heyetek ji ÎHD'ê biçe girtîgehê. **ÎZMÎR**

## Rêveberên ÎHD'ê girtin


Rêveberên Navenda Giştî ya ÎHD'ê Fîlîz Kalayci, Hasan Anlar û Serokê THYD-DER'ê ya Enqereyê Parêzer Murat Vargun û Parêzer Halîl Îbrahîm Vargun ku di encama serdagirtinên mal û kargehên xwe de ji aliyê polîsan ve hatin binçavkirin, duh sewqî dozgeriyê bûn.

Rêveberên Navenda Giştî ya ÎHD'ê Fîlîz Kalayci, Hasan Anlar û Serokê THYD-DER'ê ya Enqereyê Parêzer Murat Vargun û Parêzer Halîl Îbrahîm Vargun ku pêr bi îdiaya "Alîkarî û hewandina PKK'ê" hatin binçavkirin, piştî pirsyariya li midûriyeta polîsan sewqî dozgeriyê bûn. **ENQERE**

www.arsivakurd.org

Daxwaza ji bo çareseriya pirsgirêka kurd a bi rê û rêbazên demokratîk û aştiyane her ku diçe zêde dibin. Ligel ku piştgirî ji bo gotinên Gul ên der barê pirsgirêkê de zêde dibe, heman demê bangewaziya ji bo pêngavên pratîk jî tê kirin













# 'Niha dora bawerîdayinê ye'

Rêveberên partiyên siyasî, nûnerên saziyên sivîl û hiqûqnasan gotina Serokomar Abdullah Gul a wekî, "Pirsgirêka kurd pirsgirêka Tirkiyeyê ya sereke ye. Divê çareser bibe" nirxandin û anîn ziman ku çareseriya ji bo pirsgirêkê rast hatiye kirin û divê êdî gavên bawerî dayinê bidin gel.

Bertek û nîqaşên erênî yên li ser gotina Serokomar Abdullah Gul a wekî, "Pirsgirêka kurd pirsgirêka Tirkiyeyê ya sereke ye û divê çareser bibe. Ji bo çareseriyê bingeha guncav heye" didome. Berdevkê Meclîsa Aştiyê ya Tirkiyeyê Hakan Tahmaz, diyar kir ku çareseriya pirsgirêka kurd li sînorê çareseriyê ye û daxuyaniya Serokomar Abdullah Gul erênî dît. Tahmaz, anî ziman ku êdî tê xuyakirin ku pirsgirêk bi rêbazên leşkerî nayên çareserkirin. Tahmaz, anî ziman ku geşedanên herêmî û navneteweyî çareseriya pirsgirêka kurd bi lez dike û wiha got: "Beriya niha jî Serokwezîr gotibû 'Ma me bi gotina pirsgirêka kurd şaşî kir?' Lê belê di çareseriyê de divê tirs û tatolek tune be. Biryar hebe. Divê pirsgirêk rast bê çareserkirin û biryarek rast bê dayîn." Tahmaz, gavavêtinên ji bo çareseriya pirsgirêkê wiha rêz kir: "Divê pirsgirêka kurd bi hemû rastiyên xwe bê qebûlkirin. Ji ber vê yekê jî divê bi rastiya PKK'ê û Ocalan re werin rûqalî hev. Abdullah Ocalan daye nîşan ku ew seraktorê çareseriya pirsgirêkê ye. Divê dewlet bi Ocalan re rûnê. Ev yek dê çareseriyê bi xwe re bîne. Civak ji şer re amade ye? Na. Ji bo ev şer û xwîn raweste divê dewlet beriya her tiştî bi Ocalan re li ser masê rûnê."

### 'Divê gotin têkevin pratîkê'

Endamê Meclîsa Aştiyê Seydî Firat jî daxuyaniyên Gul erênî dît, lê belê xwest ev daxuyanî têkeve pratîkê. Firat, destnîşan kir ku demên borî jî gelek caran heman daxuyanî hatin dayîn lê belê gav nehatin avêtin. Divê gotin têkevin pratîkê." Firat, daxuyaniyên Gul, gotinên ku mirovan têr bike nedît û xwest Gul ji bo gavên aştiyane peyamên zelal û xurt bide. Firat, xwest ku Gul berdewama gotinên xwe bîne û hikûmet gavên bi cesaret bavêje. Firat wiha got: "Ji bo pirsgirêka kurd çareser bibe, divê dewlet gavên ku baweriyê bidin gel bavêje. Divê binê van gotinan bi pratîkeke pozîtîf bê tijîkirin. Divê her kes ji bo aştiyê xebatê bike."

### Projeya çareseriyê pirsî

Seroka Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Stenbolê Gulseren Yolerî, anî ziman ku nîqaşên li ser aştiyê hêviyan xurt dike. Yolerî xwest ku gotin tenê di gotinê de nemîne û gavên pratîk bêne avêtin. Yolerî wiha got: "Em dixwazin gav bêne avêtin. Di rojên borî de me bûyerên gelek xerab derbas kirin. Em naxwazin pêvajoya borî dîsa dubare bikin. Niha em îşkence, winda, girtin û operasyonê diaxivin. Ji ber ku ev bûyer tev hîn pêk tên. Pêwist e li şûna van em aştî û projeyên li ser aştiyê biaxivin. Di vî warî de çi kar têkeve ser milê me, em ji bo aştiyê amade ne."

### Rawestandina operasyonan

Serokê DTP'a Stenbolê Halîl Aksoy, bi bîr xist ku gelek gotin têne kirin û piştre têne jibîrkirin. Aksoy wiha got: "Gotinên xwe zû ji ber dikin. Ger ku Gul dibêje, 'Pirsgirêka kurd pirsgirêka herî mezin e' fermo bila çareser bike. Mixabin wisa nakin. Ji ber vê yekê baweriya gel ji wan tune. Tu hêviyê nadin gel. Ji bo baweriyekê bidin gel divê operasyonan rawestînin. Divê dewlet jî li hemberî biryara KCK'ê ya rawestandina şer operasyonan rawestîne,

### 'Gotin xilas bû, divê gav bêne avêtin'

Parêzer Kemal Aytaç jî der barê çareseriya pirsgirêka kurd de destnîşan kir ku heta niha Serokomarê berê Turgut Ozal, Suleyman Demîrel û Serokwezîrê berê Mesut Yilmaz heman gotin kirine lê belê gav nehatiye avêtin û divê êdî gav bêne avêtin. Aytaç, diyar kir ku divê pirsgirêk ne li derve li hundir bê çareserkirin û wiha got: "Ev pirsgirêk li Tirkiyeyê divê bi nûnerên kurdan ku hatin hilbijartin re bê çareserkirin. Êdî gotin xelas bûye divê gavên çareseriyê bêne avêtin." **STENBOL / DÎHA**






# Li Mêrsînê greva girseyî

Bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser DTP'ê bi beşdariya 500 kesî li Mêrsînê greva birçîbûnê ya 2 rojan hate destpêkirin.

Rêxistina DTP'ê ya Mêrsînê bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser partiyê greva birçîbûnê ya 2 rojan bi beşdariya 500 kesî hate destpêkirin. SDP, ESP, YDG-M, SEH, DÎP, DHF, Partîzan, Halkevlerî, ÎHD, Goç-Der, hewldanên 68 û 78'yan, DOKH, MKM-DER, OZ-YURT-DER jî piştgirî dan çalakiya li 4 konên li ber Rêxistina DTP'ê ya Akdenîzê hatiye vekirin, didome. Şaredarê Akdenîzê Mehmet Fazil Turk, Endamê PM'ya DTP'ê Ferhat Tarhan, Serokê Rêxistina Mêrsînê Ramazan Ekîncî, Serokê Rêxistina Akdenîzê Tahîr Aydin, endamên Meclisa Giştî ya Bajar û meclisên şaredariyan ên DTP'ê jî di grevê de cih girtin. Li avahiyên derdora qada kon lê hatine vedan pankartên, "Ne DTP'ê çekan bêdeng bike", "Em hemî kurd em hemî DTP'î ne" û "Em destûrê nadin şer" hate daliqandin. Di nav konan de jî pankarta navên DTP'iyên hatin girtin li ser hatine vekirin. Di grevê de alên PKKê hatin vekirin û ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan slogan hatin avêtin. Li derdora konan polîsan tedbîrên berfireh girtin.

### Banga hîstiyariyê kirin

Serokê DTP'a Mêrsînê Ramazan Ekîncî ku daxuyanî da, diyar kir ku Tirkiye di pêvajoyeke hesas re derbas dibe û wiha got "Ev pêşketinên han ji aliyekî ve hêviyên me yên ji bo aştiyê mezin dike û ji aliyê din ve jî fikara dê rûyê tarî yê dema borî dernekeve holê pêş dixe." Ekîncî, destnîşan kir ku operasyona piştî hilbijartina 29'ê adarê li hemberî DTP'ê hatiye destpêkirin bênavber didome û wiha pê de çû: "Gelo dê sibê li deriyê kîjanî ji me bidin? Li kîjan bajarî dê çend kes bên binçavkirin? Bi vê împaratoriya tirsê û terora tê pêşxistin hedef çi ye?"

Ekîncî, derbirî ku DTP û hêzên demokratîk biryara bêpevçûniyê ya KCK'ê ya heta 1'ê hezîranê û daxuyaniyên Serokomar ên têkildarî pirsgirêka kurd bi baldarî dişopînin û wiha axivî: "Operasyonên keyfî yên salên 1990'an tînin bîra mirov me dixe nava fikaran. Di vê mijarê de em bang li hikûmetê dikin ku li gorî hesasiyetên pêvajoyê bi hîstiyar nêzîk bibe."

Kesên tevî çalakiya greva birçîbûnê bûn jî, bal kişandin ku ji bo li hemberî operasyona li dijî DTP'ê nerazîbûnê nîşan bidin tevî greva birçîbûnê bûne. Her wiha çalakvanan li dijî operasyonên Tirkiye û Îranê nerazîbûn nîşan dan. **MÊRSÎN**

# Rayedarê Amerîkayê Mexmûr ziyaret kir

Cîgirê Berpirsê Hêzên Koalîsyonê yê Iraqê û Berpirsê Penaberan ê Balyozxaneya Amerîkayê bi heyetekê hate serdana Wargeha Penaberan a Mexmûrê.

Heyetek ji Cîgirê Hêzên Koalîsyonê yê Iraqê Orgeneral Brown û Berpirsê Penaberan ê Balyozxaneya Amerîkayê pêk dihat pêr piştî nîvro hatin serdana wargehê. Heyet destpêkê li îdareya wargehê bi berpirsiyar û endamên Saziya Têkiliyên Derve ya Wargeha Mexmûr, Şaredarê Mexmûrê, Nûnerê Dibistanên Wargehê û Midûrê Îdareya Wargehê yê Hikûmeta Federal a Kurdistanê re rûniştin.

Di rûniştinê de heyetê der barê sedemên penaberiyê û pirsgirêkên niha têne jiyîn û şertên vegera Tirkiyeyê de agahî û dîtinên nûnerên wargehê girtin. Berpirsê Saziya Têkiliyên Derve Polat Bozan ji heyetê re diyar kir ku sedemên penaberî û hatina wan a Kurdistana Federal zilm û zora dewleta tirk a li ser wan bûye û sedemên penaberiyê hêj ji holê ranebûne. Hate zanîn ku Bozan diyar kiriye ku sedema penaberiya wan siyasî ye û ew jî penaberên siyasî ne. Polat Bozan daxuyandiye ku ji ber ev pirsgirêk siyasî ye, heta çareseriyeke siyasî pêk neyê, daxwazên wan ên rewa bi cih neyên ew nikarin vegerin welatê xwe.

Piştî rûniştinê heyeta hêzên koalîsyonê li nava wargehê lêkolînên xwe kirin û der barê jiyana aborî û binesaziya wargehê de agahî girtin. Beriya ji wargehê biçin Cîgirê Hêzên Koalîsyonê Orgeneral Brown diyar kir ku ew bi hatina xwe ya wargehê der barê wargehê, penaberiyê û zilm û zora dewleta tirk a li ser gelê kurd bû xwedî agahî û alîkariya ji destê wan were dê ji bo çareseriyê pêşkêş bike. **MEXMÛR / DÎHA**

# Stenbol ji bo 24'ê gulanê amade ye

DTP li Stenbolê, bi armanca şermezarkirina operasyona li hemberî DTP'ê ya di 14'ê nîsanê de destpêkirin, di 24'ê gulanê de mîtîngekê li dar dixe. Endamê Komîteya Amadekar a Mîtîngê Dursun Yildiz, anî ziman ku ji bo mîtîngê serî li Waliyê Stenbolê dane û diyar kir ku armanca wan ew e ku zêdetirî 150 hezar kesî tevlî mîtînga 24'ê gulanê bikin.

DTP li Stenbolê bi aramanca şermezarkirina oparasyona li hemberî partiyê di 24'e gulanê de li qada Çaglayana Stenbolê bi slogana, "Ne DTP'ê çekan bêdeng bikin" mîtîngekê li dar dixe. Bo piştgiriyê ESP, SODAP, TOB, Partiya Sosyalîst, SDP, Kovara Teorî û Polîtîka, EMEP, ODP, Partîzan, YDG-M, DOKH, MKM, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, TUHAD, GOÇ-DER, ÎHD, Platforma Şaxên KESK'ê û gelek partiyên siyasî, tevgerên sivîl ên demokratîk û hin sendîka jî tevli mîtîngê dibin. Endamê Komîteya Amadekar a Mîtîngê Dursun Yildiz, amadekariyên mîtîngê nirxandin û destnîşan kir ku mîting ji bo DTP'ê di asta dîrokî de girîngiya xwe heye, bi rihê Newroz û 1'ê Gulanê amadekariyan dimeşînin.

### Tevlêbûneke girseyî

Yildiz, anî ziman ku li tevahiya navçeyan komîsyon ava kirine û civînên girseyî bi gel re li dar dixin. Yildiz diyar kir ku armanca wan tevlîbûna zêdetirî 150 hezar kesî ye. Yildiz, anî ziman ku mîtîngê ji bo bersivdayîna operasyona li hemberî DTP'ê ya di 14'ê nîsanê de pêk hatî li dar dixin û wiha got: "Em ji bo bersivdayina pêkutiyan di 24'ê gulanê de bi daxwazên xwe yên aştiyanê dîsa dê li qadan bin."

### Dê xebat bidomin

Li ser mijarê Yildiz, diyar kir ku her heta roja mîtîngê dê li tevahiya navçeyan bi wesayitan anonsa mîtîngê bikin û bilêv kir ku bi civîn, meş, daxuyaniyan, îlanan û xebatên afîşan dê bangawaziyê li gel bikin. Yildiz, destnîşan kir ku heta roja mîtîngê dê xebatên xwe bidomînin û ev tişt gotin: "Partiyên din ên siyasî, tevgerên civakê yên sivîl û sendîka dê bi daxwaz û sloganên xwe beşdarî mîtingê bibin." **STENBOL**

# MYK'a DTP'ê kom bû

Lijneya Rêveber a Navendî (MYK) ya DTP'ê têkildarî bûyerên dawî û nîqaşên li ser pirsgirêka kurd, civiya.

MYK'a DTP'ê di bin serokatiya Hevserokên DTP'ê Emîne Ayna û Ahmet Turk de li Navenda Giştî ya DTP'ê li hev civiya. Di civîna parlamenter jî beşdar bûn de pêvajoya siyasî, rewşa rêxistinî û plansazî hate nirxandin. Hate daxuyandin ku nîqaşên demên dawî yên li ser pirsgirêka kurdan bi berfirehî hatin nirxandin. Her wiha ji bo nîşandana sekna kurdan a ji bo çareseriyê û nerazîbûn nîşandayîna li hemberî zordariyên li ser partiyê dê mitîngên di 23-24'ê gulanê de li Wan û Stenbolê bên lidarxistin jî hatin axaftin. Her wiha pêvajoya kongreyê jî hatiye nîqaşkirin. **ENQERE**

Erxewan
Arjen Arî
arjenari99@yahoo.com



## Xanî û Newroz: Li ser sekoyê Cizîra Botan

Weke şairekî feqirhal, wekî kurdekî di nava kurdan de bi kurdan re hemhal; digel bindestî û bêderfetiyê min xwestiye bi çavên neviyekî ji neviyên Xanî, li xwe meyzênim.

Ligel afirîneriya xwe ew hunerbazek e, hişmendekî endazyarê hişê millî, zadeganekî hemû dewr û dewrana ye!

Ew Xanî ye: Xwediyê gencîniya neteweyî!

Weke kes, kesekî ji edeb û toreya wî misqalek bi pahra wî ketî; ez jî bi yê beriya xwe, bi yên bi xwe re û bi yên bi dû xwe re dilşad im, serbilind im, bi paye me…

Ev bipayebûn ne quretî ye, ne jî pozbilindî…

Û ji vê awir û derbirînê, ji kerema xwe bila kesek di binê dawa xwe de li heftokan negere û hewl nede -ne bibêje ne jî biniqutine dilê xwe- ku ez xwe li cihekî datînim, an jî xwe beramberî cenabê cenaban, Xanî dikim:

Ne bi afirîneriya xwe, ne jî bi helwest û sekna xwe nagihim çonga wî.

Hebe hebe yek heyran û mirî û murîdên kalê xwe me, kalê xwe yê ku gotiye:

*Pirsî ji dinê min ev bi hîkmet :*
*Mehra te çi gote min ku: Hîmmet!*
*Xwediyê himmetê ew bi xwe ye:*

Roja ku rahişt xameyê qeselî û biryara nivîsandina 'Destana Dehan' da, zanibû tiştа ku dê bike hem 'hîkmet' e, hem 'hîmmet' e, hem jî 'qudret' e…

Û wî, ev 'hîmmet' bi berhema xwe ya bêhempa kir 'qudreta' zar, bi her malikê kir 'ateşgeha' neteweyî, atêşgeha ku di hemû dewr û dewranan de agirê wê dê her gur û vêketî be.

Jixwe H.Mem'ê kurê Xanî -ji ber ku cenabê H.Mem ji Xanî re dibêje bavo, min jî wisa ra lê dît- daye dû vî agirî, vî agirê ku di rojeke Newrozê de ji nava nikilê xameyê Xanî dinizile dilê herdu dildaran û li cihekî ne lamekan; li Cizîra Botan hatiye vêxistin.

Weke tê zanîn; kurdan bi şahidîtiya dîrokê, hema bêje 2620 sal in ku bêwestan dane dû hêviya dilê xwe, roniya çavên xwe; roja Hûrmûzîn, roja ku dê ji hemû rojan zertir û bi pertewtir hilê, roja nû, yanî Newrozê!

Lêkolînerin -mînak Gurdal Aksoy- bûyera Newrozê bixwazin ji ra û rîşalên wê yên dîrokî bibirin û wê weke xebroşkekê, bi gotegot û bi mîtolijiyê ve girêbidin jî; H.Mem dide ser şopa Newroza ku ji wextê hilweşîna birc û kelehên zordariya Asûriyan ve weke salveger û destpêka sala nû bi coşa roja ewil tê pîrozkirin.

Ji bilî spartekên dîrokî, H. Mem di kitêba xwe ya bi navê 'Xanî Û Newroz' de di 12 beşan de li çîrokên agirê Newrozê digere; serî li dergeha Firdewsî, Şahnameyê dide, û nêziktêdayîna Firdewsî ya bi çavnebarî, xefker û berovajîkirinan mişt, radixe ber çavên xwîner, û ji wir dadigere ser kitêba kitêban Mem û Zînê; ku hevnaskirina herdu lehengên sereke li ser dika şanoya neteweyî serbajarê Mîrektiya Baton li Cizîrê bi destê Xanî'yê derhêner û vebêjeriya zanayê kuhensal, perdeya xwe di rojeke Newrozê de vedike.

Her xwînerên kitêba kitêban bi qasî ku ji vê rûdanê haydar e, ta niha ji hêja H.Mem pê ve kesek ranebû û neda dû vê pirsê:

Hevdûnaskirina Mem û Zîn, Stî û Tacdîn çima ne di rojeke din de, lê di roja Newrozê de; roja ku ji hêla zeman ve serdemeke nû ye, ji hêla xwezayê ve kirasguherîn e, ji hêla şev û rojê ve zeman terazîn e?

H. Mem di vir de serî li çavkaniya hemû bersivan, 'Destana Dehan', 'Manifestoya Neteweyî', 'Tewrata Kurdan'** Mem û Zînê dide û bersiva pirsa ku dê bê dayîn wisa bi wate dike:

'Belê Newroz roja nû ye; roja bi Nûbihara Biçûkan re perwerdekirî, bi Eqîdeya Îmanê kemalî, armanckirina dahatûya nivşê nû ye bi Mem û Zînê… Ango zeman û mekanê bişkivîna hêvî û adanan e…'

Armanca H.Mem ew e ku; Newrozê, Newroza ku di roja îroyîn de jî li ser vê erdnîgariya ku bûye mazûvanê gelek qewman, û destûr da ku birek ji wan konê xwe yî pircax û pirstûn vegirin û bijîn, lê paşê an konê xwe dane hev û koçber bûn, an jî konê wan rastî lehiya dîrokê hat û şop û dewsên wan hatin maliştin; lê Newroz weke rojeke ayînî, roja yadkirina hilweşîna kelehên zordariyê, roja zayîna kurrojên li dû azadiyê ji nû ve, bi şêl û temtêla zanayekî kuhensal vebêje:

Mîtolojiya di biwarê Newrozê de ji xwe re 21'ê heyvê, wê demê, dema ku Cemşîd li ser textê xwe yî remzeroji ketiye Babilê, hildibijêre. Li vir jî aşkera xuyaye ku roj bextê hemû dia û heviyan e…

Hêvî ew e ku her kes di roja ku her kes li bendê ye 'bihingive rojê'.Yanî bi gotina kurê Xanî, H. Mem 'hevîrtirşê mirovahiyê ye azadî'!

Ew jî ew roja ku her kes rigar, her azad be, ew roj e:


… … …
*Zanayê miemmerê kuhensal*
*Ev rengê ha go bo me ehwal*

*Go, 'adetê pêşî ê zemanan*
*Ev bû li hemî cî û mekanan*
*Wextê weku şehsiwarê xawer*
*Tehwîl-î dikir di mahê Azer*
*Yanî ku dihate bircê Sersal*
*Qet kes nedima di mesken û mal*
***
*Bilcûmle diçûne der ji malan*
*Hetta digihiştе pîr û kalan*
*Roja ku dibûye Îdê Newroz*
*Te'zîm î ji bo dema dilefroz*'
… … …

*Xanî û Newroz, H.Mem,Wş.Enst.Kurdî ya Stenbolê

**Destana Dehan, Manîfestoya Rizgariyê,Tewrata Kurdan:Navlêkirina H.Mem.

***Ehmedê Xanî, Hemû Berhem,Wş. Lis.



## HAWARA EYSO

DOZ GIRAN E




GULSUM HAT SIRGÛNKIRIN




ZAROKÊN ROJÊ




ZAROKÊN ME PÊŞEROJA ME NE





rizoxerzi@gmail.com
Rizoyê XERZÎ

## Çêleka Zer û Dadgeha Tirk

Her gav di nivîsên xwe de ez hewl didim ku behsa mijareke rojevê bikim û pê re jî ew bûyer serpêhatiyekê an jî pêkenokekê tîne bîra min û ez hewl didin ku di nivîsa xwe de hem behsa rojevê bikim, hem jî behsa pêkenokekê an jî serpêhatiyekê bikim. Mala çêleka zer Gulsumê ava be vê carê hewce nake ez jî bo rojevê li serpêhatî û pêkeniyan bigerim. Çîroka çêleka zer hem rojev û rastiya hişmeniyekê ye, hem jî pêkeniye û bûyereke rastî ye, weki çîrokek Eziz Nesîn e.

Li navçeya Yeşilyurta Malatiyayê li gundê Kadiruşagi çêlekekê jî got êdî bes e û berê xwe da dibistana gund. Çêlek dema derbasî hewşa dibistanê dibe wa dinêre ku mirovekî gir madê xwe tirş kiriye û pozê xwe bilind kiriye weki ku bêje were em bi poşan bilîzin, hema çêleka me jî yekê nake dido, lingê xwe bi erdê ve dixijiqîne, xwe hinekî bi paş de dide û berê xwe dide hedefa xwe. Bi poşa çêlekê re serê Mêrik digindire erdê. Heta vir her tişt normal xuya dike lê piştî ku mesele bû lêkolîn û doz, xwediyê çêlekê mecbûr man ku çêleka xwe ya poşek sirgûn bikin û bişînim gundekî din.

Ma pepûka çêlekê ji ku zane heykel çiye û ji ku zane ku ew heykel ê mezinê tirkan Mistefa Kemal e. Li ser vê bûyerê rapor çûn û hatin, mifetişek ji bo lêkolîna bûyerê şandin dibistanê.

Di encama lêkolînê de û piştî şêwir û mişêwira giran xwediyê çêlekê mecbûr ma ku çêleka xwe sirgûn bikin da ku careke din bêedebiyeke wiha neke. Li gorî gundiyan kebaniya malê gelekî parêzgeriya çêleka xwe kiriye û bi her sê navê xwedê sûnd xwariye ku çêleka wê ne ji qestî serê heykel firandiye lê bê hemdî qewimiye. Tevî hemû hewldanên kevaniya malê, xwediya çêleka zer, nikaribû bibe asteng li pêşiya sirgûnkirina çêleka xwe.

Bi her halî berê gotine her ku serî mezin dibe mirov ecêban dibîne, di vê çîrokê de tiştê ku min nizanî û gelekî meraq dikim ew e ku xwediyê vê çêlekê kurd in an jî çepgirên tirk in ez nizanim. Tiştekî din ê balkêş ew e ku em kurd her dem gazincan ji dadgeha tirk dikin û bi taybetî jî dema ku di vê dema dawî de cezayên zindanê ên giran li zarokên kurdan birîn lê bi vê çîrokê derkete holê ku halê wan dadgehan çi ye. Îca xwedê wan bistirîne, heke çêlek ya mirovekî welatparêz be xwedê jê stand û wê mala wî li malan bigere.

## Riyên pêşketina wêjeya kurdî -II-



Ezîzê CEWO

Helbet, her beşekî mijara vesazbûn û pêşveçûna wêjeya kurdî hêjayî lêgerîna kûr û piralî ye. Û ji bo wê jî em ê vê mijarê bi tomeriya xwe ve jî lêkolînerên dihatûyê re bihêlin û ji vir û pê ve li ser pirsgirêkên wêjeya kurdî rawestin -bi giştî, li ser riya wêjebûnê-.

Eger bê xwestin ku mirov li ser wêjeya kurdî bi nirxandinekê tomar bike, ango bi nivîskî dîmenekî wê yê tam derxe holê, dikare bibêje ku di nav me de nivîs pir in, heta gelek pirtûkên stûr jî hatine û tên weşandin... lê wêje kêm e. Belê, pirtûk pir in, lê wêje kêm e. Û ji bo ku wêjeya me xwe bigihîne asta pêwîst, ew divê hê riyeke dûr a dirêj derbas bibe.

Çima?

Çima, em bibêjin, di nav me de hema romaneke li ser radeya "Memedê zirav" ya Yaşar Kemal jî tuneye. Êdî em der barê afirandinên nivîskarên wek Hugo, Balzac, Tolstoy, Drayzer, Şolohov, Hemingway û yên din de nabêjin.

Çima? Dema mirov nivîsên nivîskarên biyanî yên bi neteweya xwe ve kurd dixwîne, bi dilêşî vê pirsê dide xwe û bersivekê digere, ya ku bikaribe rastiya wêjeya me derxîne holê...

Îro "nexweşiya tiştekinivîsandinê û tiştekweşandinê" di nav beşekî gelê me de (rewşenbîr- ne rewşenbîr, xwendînîvxwendî an nexwendî!) belav bûye. Hinek, wê her tiştî bikin, ji bo xatirê wê, ku tiştekî bi navê xwe biweşînin. Dibe ku li vir hinek xeyd û gazinên xwe jî bidin xuyan -hem yên ku bi rastî nivîskar in, hem jî yên ku bi hezarê kîlometreyan ji wêjeyê û nivîskariyê dûr in-. Helwest li hemberî vê çawa dibin, bila bibin, lê rastiya me îro ev e! Û sedemên vê rewşê yên objektîf û subjektîf hene.

Rojekê divê em di nav xwe de wêrekiyê bibînin û rastiya xwe bipejirînin û ji hev re bibêjin ew çiqas tel dibe, bila bibe.

Tiştê ku wêrekiyê dide yên dûrî wêjeyê, ku ew çepilan hildin û bikevin govenda wêjeya kurdî û vî alî wî alî pê lingên derdorên xwe bikin, ew e, ku: perwerdeya bi zimanê kurdî bi sîstemî tune bûye û îro her kurdek zimanê biyanî û serdestan ji zimanê xwe yê dê baştir dizane (bêguman, ev yek bêtir trajedî û ne ku gunehê wan e); nexwendîtiya zimanê kurdî, ya ku bi dîrokî di nava me da bûye "desthilatdar", hê jî serdest e, û di warê nizanbûna zimanê kurdî de yên zane û nezan weke hev dibin; gelê me heta vê dawiyê bi sê alfabeyan dinivîsî û dixwend (ew jî wey li wê nivîsandin û xwendinê!) pirsgirêkên alfabêya heyî, nerûniştîbûna qanûnên rastnivîsandin û rastaxaftinê di rêzimana kurdî de, ya dibe sedem ku mirov nikaribe bi kurdî rast binivîse û bixwîne; di nav me de înstîtû (sazî) redaktekirina pirtûkan, ên ku tên weşandin, nîne û nebûye çanda weşanên me: kî çawa dinivîse, nivîsa wî wisa jî tê weşandin; rexnegeriya wêjeyî di nava me de negihiştiye û nebûye tore û çandek.

Dibe ku mirov bikaribe dîsa rêze sedemên din jî bîne, lê ev jî bes in, ku mirov têbigihêje, ka divê çi di nav nivîsandin, xwendin û wêjegeriya me de bê guhartin, ji bo ku wêjeya me bibe wêje.

www.arsivakurdi.org

# 'Li her derê bi kurdî biaxivin'

Bi wesîleya Cejna Zimanê Kurdî, Serokatiya KONGRA GEL daxuyaniyek weşand û ev roja girîng û watedar di serî de li kedkarên zimanê kurdî, li hemû kurdistaniyan pîroz kir.

Serokatiya KONGRA GEL di peyama xwe de destnîşan kir ku ziman şertê bingehîn ê netewe û netewîbûyînê ye û got, "Eger neteweyek li zimanê xwe xwedî dernekeve, ew netewe nikare bijî. Dîrokê ev rastî nîşanî me da. Gelek neteweyên navdar ên mîna Misir û Sumeran, ji ber ku nekarîbûn xwedî li zimanê xwe derkevin, ji holê rabûn." Di peyamê de hat ragihandin ku yên li her qadê xwedî li zimanê xwe derketine jî, îro bi serbilindî dijîn û ev xal hat destnîşankirin: "Ligel mêtîngerî û talana sedsalan, gelê kurd zimanê xwe parastiye. Dijmin bi dijwarî êrîşî zimanê me kurdî dike. Di roja îro de jî, li ser zimanê me qedexe û êrîşên giran hene. Asîmîlasyoneke dijwar tê meşandin. Eger em karibin xwedî li zimanê xwe derkevin, hingî em ê karibin hemû nirxên xwe biparêzin. Di roja îro de, xwedîderketina li ziman, wezîfeya herî girîng û netewî ye." Di peyamê de tê gotin ku ji bo zimanê kurdî were parastin divê bibe zimanê perwerdeyê û pêwîst e kurdî li Kurdistanê bibe zimanê fermî û zimanê aboriyê, daxwaza wan a bingehîn jî ev e. Di peyamê de bal kişandiye ser girîngiya bikaranîna zimanê kurdî ya li her qada jiyanê û ragihandinê, ku pêwistî bi jiyana bi kurdî heye. Di dawiya peyamê de, bang li hemû kurdan hatiye kirin ku bi kurdî biaxivin û hêj bêtir xwedî li zimanê xwe derkevin. **BRUKSEL**

# Cejna Zimanê Kurdî bi coş tê pîrozkirin

## Cejna Zimanê Kurdî îsal dê li gorî salên dawî zêdetir bê pîrozkirin û kurd bi pîrozkirina cejna ziman dê çalakiyên cur bi cur li dar bixin, peyama xwedîderketina ziman bidin û bi coşeke mezin pêşwazî bikin

Cejna Zimanê Kurdî ku hefteyekê berdewam dike îsal dê li gelek bajar û navçeyan bi coşeke mezin bê pîrozkirin. Di çarçoveya pîrozbahiyên dê hefteyekê berdewam bikin de dê çalakiyên cur bi cur bên lidarxistin. Di pîrozbahiyan de girîngiya parastin û pêşvebirina zimanê kurdî dê bê destnîşankirin. Her wiha dê fermîbûna zimanê kurdî jî wekî rojeveke sereke bê bilêvkirin.

Bi boneya 'Kovara Hawarê' ku di warê pêşvebirina zimanê kurdî de xwedî roleke girîng e di sala 1932'an de ji hêla Celadet Elî Bedirxan ve hatiye derxistin û 15-22'yê gulanê ji hêla Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ve ji sala 2006'an heta niha wekî Cejna Zimanê Kurdî hatiye îlankirin. Cejna Ziman di salên dawî de zêdetir tê pîrozkirin, dê îsal jî bi coşeke mezin bê pêşwazîkirin.

Xebatên di warê zimanê kurdî de berdewam dikin. Ji bo Cejna Zimanê Kurdî ya ku îsal hefteyekê tê pîrozkirin, dê çalakiyên cur bi cur bên lidarxistin. Di çarçoveya pîrozbahiyan de di navbera 15-22'yê gulanê de li Amed, Êlih, Wan, Şirnex, Sêrt, Colemêrg, Agirî, Îdir, Qers, Bedlîs, Semsûr, Riha, Enqere, Îzmîr, Stenbol, Farqîn, Erxen, Pîran, Karaz, Hênê, Hezro, Çinar, Qoser, Şemzînan, Gever, Çelê, Elbak, Gîhadîn, Dîgor, Kaxizman, Miks, Norşîn, Tetwan, Bazîd, Patnos, Qerqelî, Erdîş, Bêgirî, Milazgir, Serêkaniyê, Wêranşar, Pirsûs, Silopî û Nisêbînê daxuyaniyên çapemeniyê yên bi tevlîbûna girseyên gel bên dayîn. Li gelek deveran dê ji bo şiyariya ziman belavok bên belavkirin. **AMED / DÎHA**




*Li Herêma Serhedê jî Cejna Kurdî 10 rojan dê bi çalakiyên cur bi cur bê pîrozkirin. Cara yekemîn li Wanê bi fermî ji hêla Şaxa KURDÎ-DER'ê ya Wanê ve li ser bîlbordan afîşên kurdî hatin daliqandin.*




### Bernameya pîrozbahiyên cejnê wiha ye:

**15'ê gulanê:**

Li Sêrt, Bismil û Rihayê panel.

Li Cizîrê dê komeleya Kurdî-Derê bi girseyî bê vekirin. Piştî vekirinê dê gora Melayê Cizîrî û Mem û Zînê bêne ziyaretkirin.

Li Mêrsînê dê şahî bê lidarxistin. Li Edenê li muzîkholê dê şahî bê lidarxistin. Li Îzmîrê meşeke girseyî û li NÇM'ê dê şahiyek bê lidarxistin.

Piştî daxuyaniyên çapemeniyê dê li Bazîdê gora Ehmedê Xanî, li Tetwanê gora Feqî Huseyn Sagniç û li Miksê gora Feqiyê Teyran bêne ziyaretkirin.

Dê li Wanê Çadira Ziman û standa pirtûkên kurdî bê vekirin û hefteyekê vekirî be.

Li Êlihê dê hefteyekê li sê malên piştgiriya perwerdeyê, sînemaya Yilmaz Guney filmên kurdî bên nîşandan.

**16'ê gulanê**

Li Enqere, Amed, Qoser, Êlih, Şemzînan, Erdîş, Patnos, Colemêrg û Wanê panel. Li Êlihê meşa girseyî. Li Wêranşarê şeva dengbêjan. Li Geverê şahî. Li Wanê di çadira ziman de roja îmzeyê. Li Stenbolê ji ber NÇM'ê heta Galatasarayê dê meş bê lidarxistin û daxuyaniya çapemeniyê bê xwendin. Êvarê jî li NÇM'ê şahî bê lidarxistin.

Li Milazgirê piştî daxuyaniyê ji bo evîna ziman dê qurnefîlan bavêjine avê.

**17'ê gulanê**

Li Amed, Bedlîs, Îdir, Elbak, Qers û Farqînê panel. Li Wanê di Çadira Ziman de roja îmzeyê. Li Silopiyê şahî. Li Sêrtê şahî.

**18'ê gulanê**

Li Wanê di Çadira Ziman de roja îmzeyê.

Li baxçeyê şaredariyê bi piştgiriya hemû xwaringehên Êlihê ji bo xwarinên kurdî kermes.

**19'ê Gulanê**

Li Amed, Erxenî, Tetwan, Bazîd, Gever û Ozalpê panel. Li Êlihê, li Mala Piştgiriya Perwerdeyê ya Ahmet Kaya şahî. Li Semsûrê şanoya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Mala Dînan. Li Dîlokê seyran.

**20'ê gulanê**

Li Êlihê, li Mala Piştgiriya Perwerdeyê ya Edîp Solmaz şahî.

**21'ê gulanê**

Li Enqere, Giyadîn, Bêgîr û Kaxizmanê panel. Li Wanê şeva helbestxwendin, pêşbirk û dengbêjên jin. Li Êlihê, li Mala Piştgiriya Perwerdeyê ya Mûsa Anter şahî.

**22'ê gulanê**

Li Sixkê û Dîgorê panel. Li Êlihê li parka Ataturk şahî.

**23'ê gulanê**

Li Amedê li parka Koşuyoluyê şahî.

**24'ê gulanê**

Li Agirî, Norşîn û Çelê panel.



Şevçira
Omer Dilsoz
omerdilsoz@yahoo.com

# Zimanê êşê (>) êşa zimanî

Zimanê êşê tune ye; êş, bi her zimanî tûj e, dir e, dihingêve, tal e, diêşîne… Zimanê êşê bi her zimanî 'êş' bi xwe ye.

Lê êşa zimanî cuda ye, êşa zimanî heye û gelek jî dijwar e; çimkî, ev êş tenê di hin zimanan de heye û ev êş jî ji ber zimanên bêêş çêdibe, an jî, ji ber derba (peyva ku ji ser zimên tê derê) peyda dibe… Hetta; tê gotin, 'li şûna birîna xencerê dicebire lê li şûna gotin(a tal)ê nacebire.' Êşa zimanî ew kul û birîn e ewa şûna wê dibe gîsî û qet nacebire…

Zimanê hezkirinê tune ye; hezkirin, bi her zimanî hişîmendiyek e, xweş e, şirîn e, germ e… Zimanê hezkirinê bi her zimanî dilfirînek e, dillerzikek e, dilzîziyek e, hiş û sewda ji serî dibe…

Lê hezkirina zimanî gelekî xweser e; çimkî, di her zimanî de eynî nîn e, her kes jê hez nake, bala her kesê nakêşe û bo her kesê nabe xem û keser; ji ber hindê jî, hezkirina zimanî bi ser êşa zimanî ye.

Zimanek çend biêşe, xwedanên wî zimanî mecbûr e, bêhtir xwe bide ber wî zimanî û bêhtir hez jê bike.

Zimanê êşê, hestpêkirin e; êş hest dibe, mirov wê seh dike.

Êşa zimanî, pêhesiyan e; ziman diêşe, mirov pê dihese û hewl dide wê êşa wê bikewîne.

Heke hişmendiya me ya bo zimanî ev esasên li jorî bin û em bi vê perspektîfê berê xwe bidinê; wê demê çêtir e, em pêdaçûneke hêj berfirehtir bikin û vê êşa zimanî bînin li bejna kurdî ya îro bifesêlin.

Kurdî ne ji çu zimanan pîroztir e, ne jî ji çuyan lanettir… Ew jî, belkî bi awayekî teknîkî tenê organîzmayeka danûstandinê be û ji alaveke derbirîn û têkilîtêdayînê wêdetir, tenê wekî sehkera tamijandinê bête fêmkirin…

Yanî, organeka basît ê mirovî; heta ne tenê yê mirovî, yê giyaneweran gişan…

Heke, em bi vî çavî berê xwe bidinê, hingê êşa zimanî ji bo însan û ajalan wek teknîkî 'eynî' ye û ji bilî şewat û zirîyana ji tal û tirşî, kel û sarî 'çu tişt' nîn e.

Lê belê, merem û mexseda me ji êşa zimanî ewa bi zimanê êşê dirûv digire, bi hezkirin û xwedanîbûna wê bi serûpê bibe; me digihîne biyavekî nû û cudatir, li wê derê, ziman ji organîzmayeka tamijînê derdikeve û dibe wate û nirxeke gelemperî, dibe çira û çirûskeke rewneqdar û teşe û dirûvê miletekî, sînor û xwîngiriya wî milletî destnîşan dike.

Di vê maneyê de êşa zimanî' dibe êşa hebûn û nebûna milletekî…

Yanî, zimanek çend birîndar û kul be, ruhê wî milletî jî hin birîndar û kul e. Li vê derê zimanê êşê vedigere êşa zimanî…

15'ê Gulanê roja zimanê kurdî pîroz be!

# Tenê gotin têrî nake!

**Delîl FIRAT** - AMED / ANF

Li Tirkiyeyê ji aliyekî ve li ser makezagona nû nîqaş tên kirin ji aliyê din jî hikûmet cerdevaniyê diparêze û di pratîkê de kurdî tê qedexekirin. Di makezagona nû de cih girtina cerdevanî û qedexeyên li ser ziman mirovan dixe gumanê ku ew makezagon çiqas 'nû' û 'sivîl' e.

Demên dawî ji devê rayedaran bikaranîna kurdî û navê gundan careke din bikaranîna kurdî wekî nêrînên 'erênî' balê dikişîne. Lê kesên wekî berdevkê hikûmetê Cemîl Çîçek bi 'sûcdarkirin û hedefnîşandanê' pêşiya diyalogan digire.

Piştî qetlîama Mêrdînê pergala cerdevaniyê hate nîqaşkirin lê ev nîqaş wekî 'parastina cerdevaniyê' reng guherî. Wezîrê Karê Hundir Beşîr Atalay ji bo bikaranîna navên gundan ên kurdî got: 'Ger xwestekên herêmî hebin çima tiştekî wisa nebe' lê xwestekên herêmî rastî dîwarên dozgeriyê tên. Beriya hilbijartinên 29'ê Adarê di patenta dewletê de bi navê TRT 6 kanalekê bi dest weşana kurdî kir lê kesên ku di mîtîngan de, li girtîgehan kurdî axivîn, kurdî slogan avêtin û bi kurdî propaganda kirin, kurdî kart û afîş çap kirin rastî doz û girtinan hatin.

Serokomar Abdullah Gul jî qebûl kir ku pirsgirêka sereke ya Tirkiyeyê pirsgirêka kurd e lê ev pirsgirêk tenê bi gotinan nayê çareserkirin. Ev pirsgirêk beriya avakirina Komara Tirkiyeyê jî hebû piştî avakirina komarê jî didome. Kurdan ji bîr nekir ku heta niha ji bo çareseriyê gelek soz hatin dayîn û axaftin hatin kirin lê pirsgirêk nehat çareserkirin. Kurd di vê mijarê de aşkera ne ku çareseriyeke bê ewle ne çareserî ye. Heta ku gotinên rojên dawî nekevin zagonan di pratîkê de tiştekî îfade nakin.

✓ Beriya hilbijartinên herêmî ya 29'ê Adarê gelek siyasetmedarên kurd ji ber ku kurdî axivîn bi dozan re rû bi rû man. Ji bo gelek siyasetmedarên kurd cezayên girtîgehê hatin dayîn.

✓ 3 parkên ku ji aliyê Şaredariya Kayapinarê ve hatin çêkirin ji ber ku ji bo van parkan navên Rojna, Şîlan û Rojda hatin dayîn ev nav ji aliyê Qaymeqamiyê ve hatin redkirin. Beşîr Atalay ji bo navên gundan ên kurdî gotibû 'ger xwestekên herêmî hebin çima nav neyên dayîn' lê li hemberî xwestekên herêmî biryar nehat qebûlkirin, bi ser de doz têne vekirin.

✓ Di girtîgehan de qedexeyên li ser kurdî didomin. Destûr nayê dayîn ku kesên tirkî nizanibin bi xizmên xwe girtî re hevdîtinan pêk bînin. Dema girtî di telefonan de bi malbatên xwe re dest bi axaftina kurdî dikin telefon tên girtin lê li hember van kirinan di 11'ê gulanê de Komîsyona Mafên Mirovan a TBMM'ê îdia kiribû ku axaftina kurdî nayê astengkirin.

✓ Ji bilî girtîgehan li kuçeyan jî axaftina kurdî tê qedexekirin. Di meha nîsanê de li Muradiyeya Wanê xwendekarên lîseyê ku di navbera xwe de maç dikirin û ji ber ku kurdî gotin pas biavêje rastî êrîşa polîsan hatin, 4 xwendekar birîndar bûn û xwendekar hemû hatin binçavkirin.

✓ Çapemeniya kurdî rastî girtin û cezayan tê. Ne tenê bi kurdî çapemeniya kurdan a tirkî jî rastî ceza û girtinan tê. Mafê kurdan ê agahî girtin û dayînê tê astengkirin. Ji serê salê vir de rojnameya Azadiya Welat 2 caran hat girtin û her wiha rojnameya Rojev bi boneya propagandaya rêxistinê dike hat girtin. Ji sala 2008'an heta îro bi dehan rojnameyên kurdan hatin girtin.

✓ Ji bo kurdan siyaset jî qedexe ye. Piştî hilbijartinên herêmî li hember siyasetmedarên kurd furyaya girtin û binçavkirinan dest pê kir. Di nava mehekê de herî kêm hezar DTP'î hatin binçavkirin pirtirî 300 kesî hatin girtin.

# Leyla Qasim li Hewlêrê hate bibîranîn



Yekîneya Jinê ya PÇDK'ê ji bo Leyla Qasim ku di 13'ê gulana 1974'an de ji aliyê rejîma Sedam ve hate bidarvekirin, bernameyek bibîranînê li dar xist.

Yekîneya Jinê ya Partiya Çareseriya Demokratîk a Kurdistanê (PÇDK), ji bo bibîranîna Leyla Qasim li Otela Hawraman bernameyeke bibîranînê li darxist. Di bernameya bibîranînê de 1'emîn Endama Lîsteya Hîwa ya beşdarî hilbijartinên Herêma Kurdistanê dibe û PÇDK piştgiriyê didê Necîbe Omer û hevala Leyla Qasim axaftinek kir û anî ziman ku Leyla Qasim li Kurdistanê pêşengiya jinan kiriye. Omer, diyar kir ku têkoşîn, sekn, biryar û cesareta Leyla Qasim rê li pêşiya jinên kurd vekiriye û wiha got: "Piştî Leyla Qasim, Sema Yuce, Viyan Caf, Zîlan derketin ser dika dîrokê.

Piştî Omer hevala Leyla Qasim, Abbas jî axaftinek kir û diyar kir ku Leyla Qasim ne tenê di têkoşîna jina kurd de her wiha di têkoşîna hemû jinên cîhanê de bandorek çêkiriye. Abbas, bi bîr xist ku Leyla Qasim mirovek sosyalîst bû û wiha got: "Leyla Qasim hem sosyalîst bû û hem jî aliyê wê yê welatparêziyê gelekî xurt bû.

**Leyla Qasim**

Di sala 1952'yan de li Kerkûkê ji dayik bû. Piştî dibistana seretayî û ya navîn qedand bi malbata xwe re koçberî Baxdayê bûn. Qasim piştî lîse qedand di 20 saliya xwe de Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê (YXK) nas dike û alîkariyê dide wan. Leyla Qasim di vê pêvajoyê de biryara tevlêbûna pêşmergeyan dide. Di bihara sala 1974'an de rejîma Baasê li hemberî kurdan dest bi şer kir. Malbatên kurd ji Bexdayê derxistin. Rejîma Iraqê bi bombebarananakirina Qeladizê û Halepçeyê qetlîameke sivîl pêk anî û bi hezar kesî jiyana xwe ji dest da. Di vê pêvajoyê de ji bo Leyla Qasim dengê kurdan bigihîne cîhanê bi revandina balafirekê hat peywirkirin. Lê di vê çalakiyê de bi ser nakeve û Leyla Qasim bi 4 hevalên xwe ve di 24'ê nîsana 1974'an de hatin girtin. Qasim bi 4 hevalên xwe ve di 13 gulana 1974'an de hatin bidarvekirin. Leyla Qasim di dema darazê de dibêje, "Min bikujin lê vê rastiyê jî bizanibin ku bi kuştina min wê bi hezaran kurd hişyar bibin. Ez ji ber di riya azadiya Kurdistanê de canê xwe didim ez pir kêfxweş im û serfiraz im." Dema çûye ber darê sêdarê sirûda Ey Raqîp xwendiye. **HEWLÊR / DÎHA**

# Cerdevaniyê ji êşan pêvetir tiştek neanî

Jinên hevserên xwe di dema cerdevaniyê de, di encama pevçûnan de jiyana xwe ji dest dane bi neçarî koçî Wanê kirine. Cerdevaniyê ji bilî êşan tiştek nedaye wan ji bo wan cerdevanî tê wateya mirin û kuştinê

**ERDOGAN ALTAN** – WAN / DÎHA

Piştî komkujiya cerdevanan a li gundê Zangirta navçeya Şemrexa Mêrdînê bû sedema kuştina 44 kesan, pergala cerdevaniyê ya li herêmê bûye sedema bi sedan kuştin, girtin, koçberkirin, şewitandina gundan û gelek bûyerên din jî tê nîqaşkirin. Beşek kesên ji cerdevaniyê bandoreka mezin girtî niştecihên bajaroka Ertûşa navçeya Çelê ya Colemêrgê ye. Çelê di salên 1990'an de ji 700 malan pêk dihat. Niştecihên bajarokê di navbera salên 1990-1992'yan de bi zorê kirin cerdevan û çek dan destê wan. Ji ber ku di hemû operasyonan de kesên bêdilî wan kirine cerdevan didan pêşiyê 42 cerdevanan jiyana xwe ji dest dan.

**Ji gundê xwe jî bûn**

Li bajaroka 42 cerdevanan jiyana xwe ji dest dan, piştre di sala 1995'an de pirsgirêka ewlehiyê wekî hincet hate nîşandan û bajarok bi temamî hate xalîkirin û hin ji wan jî koçî Wanê bûn. Di sala 1998'an de malbat li taxa Yalimerez a Sixkeya Wanê, di konutên biçûk de hatin bicihkirin. Jinên hevserên wan ên cerdevan di pevçûnan de jiyana xwe ji dest dan, bi salan e di van konutan da têkoşîna jiyanê didin.

**'Dewletê em li holê hiştin'**

Asmîn Kaya (57) ku hevserê wê di encama pevçûna di sala 1993'yan de jiyana xwe ji dest daye, diyar kir ku cerdevaniyê tenê êş ji wan re aniye. Kaya, destnîşan kir ku cerdevanî bû sedema koçberî, mirin, xizanî, perîşaniyê û wiha axivî: "Beriya cerdevaniyê bi salan jiyaneke me ya xweş û geş hebû. Cerdevaniyê jiyana me tarî kir. Beriya em bibin cerdevan her tiştên me hebû. Lê bi cerdevaniyê re ev hemû ji destê me çû. Em ketin rewşek ku nikarin ji mala xwe jî derbikevin. Ya dawî hevserê min jî mir. Dewlet çewa em li holê hiştin û gundê me jî da valakirin. Niha em hewceyî nanekî ne."

**'Ew wekî şehîd jî qebûl nekirin'**

Gurcî Duman ku dîsa di heman salê de hevserê xwe Mîrhan Duman di pevçûnekê de winda kiriye jî da zanîn ku ji ber birê hevsera wê nîn e, piştî hevserê wê mir kes tunebûye li zarokên wê binêre. Duman, destnîşan kir ku rayedarên dewletê hevserê wê wekî şehîd jî qebûl nekiriye. Duman, anî ziman ku piştî hevserê wê miriye ew neçar mane koçî Wanê bibin. Duman, ev tişt gotin: "Em perîşan bûn. Jiyana me li ber avahiyên walîtî û komeleyên şehîdan derbas bû. Ji me re hate gotin ku 'Dikarin tenê alîkariya malbatên leşkeran bikin. Alîkariya malbatên cerdevanin nakin'. Em bêzar kirin."

**'Çek girtin lê dîsa koçber bûn'**

Dayika cerdevanê bi navê Abdulkadîr Kaya Fatma Kaya jî, diyar dike ku ji bo koçber nebin çek girtine lê piştre cardin dewletê ew koçber kirine û wiha pê de çû: "Beriya em bibin cerdevan hemû cure sewalên me hebûn. Bax û bostan, ewqas zêde darên gûzê hebûn ku hemû gundiyan dikaribûn debara xwe pê bikin. Tu pirsgirêkê me nîn bû. Ji me re gotin bibin cerdevan û em pir tengav kirin. Me ji bo ew tiştên niha hejmartin winda nekin, neçar man cerdevanî qebûl kir. Lê em him bûn cerdevan û him jî koçber bûn, me dewlemendiya xwe winda kir û me nekarî tiştekî jî ji mala xwe re bistînin. Ma jiyaneke wiha dibe?"

**Nikarin meaşê hevserê xwe bistînin**

Hevsera cerdevanê bi navê Abdulkadîr Kaya Hacer Kaya jî, da zanîn ku ji ber dema ew zewicîn nîkaha fermî tune ye, nikare meaşê hevserê xwe jî bistîne. Kaya, wiha got: "Mirina hevserê min ne bes bû, zehmetiya koçberiyê, zehmetiya têkoşîna jiyanê, mezinkirina zarok û neçarî jî di ser de hat. Ji ber ku nîkaha fermî nîn e, ji ber vê yekê meaşê hevserê xwe nikare bigire."

**Cerdevaniyê ji wan re mirin anî**

Rahmî Kaya jî, diyar kir ku dema bavê wî hatiye kuştin ew 2 salî bûye. Kaya, da zanîn ku êşa herî mezin mezinbûna bêbav e. Kaya, destnîşan kir ku dewletê bi zorê bavê wî kiriye cerdevan û şande mirinê. Kaya, wiha pê de çû: "Bavê min ji bo gund bernede, dayika min û min fikirî, cerdevaniyê qebûl kir. Piştî mirina bavê min yê wê kirin cerdevan jî tu alîkariyê nedan me. Yanî cerdevaniyê tenê mirinê ji me re anî. Heke cerdevanî tunebûya, min ê bi bavê xwe re bijiya. Divê ev cerdevanî bê rakirin."



Wêne: Nazan SALA

## Tiba Edlî protesto kirin

Endamên Platforma Jinan a Li Dijî Şîdeta Cinsî, xwestin ku Lijneya Îhtîsasa 6'emîn a Dezgeha Tiba Edlî careke din di ber çavan re bê derbaskirin.

Endamên Platforma Jinan a Li Dijî Şîdeta Cinsî da zanîn ku her tim Dezgeha Tiba Edli bi raporeka cuda tê rojevê. Jinên endamên platformê li ber avahiya Dezgeha Tiba Edlî ya Yenîbosnayê civiyan û dowîzên wekî "Ji şîdetê re na" û "Bila tiba edlî careke din bê sazkirin" vekirin. Li ser navê plaformê Esen Ozdemîr, axaftinek kir û diyar kir ku dezgeh bi wî halê xwe bersivê nade pirsan. Ozdemîr got ku divê dezgeh careke din bê sazkirin ku êdî mexdûran neke mexdûr. **STENBOL**

## 9 girtî sewqî Mîdyadê kirin

Piştî operasyona li hemberî DTP'ê a 14'ê nîsanê pêk hatî 23 jin hatin girtin. 23 girtiyên jin şandin Girtîgeha Girtî ya Tîpa E ya Amedê, ji wan 9 jinan jî sewqî Girtîgeha Girtî ya Tîpa M a Mîdyadê kirin.

Li gorî agahiyên ku hatin bidestxistin 9 girtiyên ku ji ber ku girtîgeha Amedê cih nîn e sewqî Girtîgeha Girtî ya Tîpa M a Mîdyadê kirine ev in: Hacîre Ozdemîr, Pinar Işik, Çîmen Işik, Esma Guler, Sara Aktaş, Pero Dundar, Leyla Denîz, Herdem Kizilkaya, Zohre Bozaci û Sêvê Demîr. **AMED**

# BÎRANÎN



Halît Balta
1974 - 1990

'Daran belg weşandin
Ewran rondik rijandin
Gulan çiya hejandin
Ji evîna te ey şehît...'

**Li ser navê malbata wî birayê wî Nûrettîn Balta**

# Ji girtiyên DTP'ê re name şandin

Endamên Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk (DOKH) ji girtiyên DTP'ê re name şandin û her wiha li hemberî sewqkirina 9 girtiyên jin jî nerazîbûn nîşan dan. Endama DOKH'ê Selma Koç, diyar kir ku 9 girtiyên jin bê îradeyên wan bi lêz sewqî girtîgeha Mîdyadê kirin vê pêkanînê şermezar dikin.

Şaredara Baglarê Yuksel Baran, şaredara Bismilê Fîkriye Aytîn û bi sedan jin li AZC Plazayê civiyan û li ser navê DOKH'ê Selma Koç axaftinek kir. Koç di axaftina xwe de bal kişand ser operasyonên li hemberî DTP'ê û got ku operasyona li hemberî çareseriya pirsgirêkê pêk hat. Koç, destnîşan kir ku di 29'ê adarê de serkeftina ku hatî bidesxistin, banga KCK'ê a 1'ê Hezîranê û xwedîderketina nirxan a gel rantxur aciz kirin. Koç, da zanîn ku bi operasyonan hat xwestin van pêşketin û serkeftinan pûç derxin û wiha axaftina xwe dom kir: "9 hevalên me bê îradeyên wan hatin sewqkirin. Em wekî endamên DOKH'ê bang dikin ku tu hêz nikare têkoşîn û berxwedana me asteng bike." Piştî daxuyaniyê jinan berê xwe da postexaneya Yenîşehrê û ji 23 girtiyên jin re name şandin. **AMED**



*Endamên DOKH'ê ji 23 girtiyên jin ên DTP'ê re name şandin.*

www.arsivakurdi.org

# Başûr di nava tozê de ma

Li başûrê Kurdistanê şepola dawî ya tozbarînê bû sedem ku zêdeyî 250 kes neçar bibin berê xwe bidin nexweşxaneyan. Piraniya wan jî ew kes bûn nexweşiya wan a tengenefesiyê hebû. Di tozbarîna dawîn de vê carê asta dîtinê jî bi qasî 200-300 metre kêm bû.

Ev 2 sal in çendîn şepolên tozbarînê Başûr û beşekî zêde ji bajarên bakurê Kurdistanê jî dagir kirin. Ya dawî şepola hefteya borî bû û hemû parêzgehên başûrê Kurdistanê girt, bi taybetî jî Hewlêr û Kerkûkê.



Rêvebirê Kargêrî yê Nexweşxaneya Bihewarêveçûnê ya Hewlêrê Muhsîn Zirarî, diyar kir ku di 24 saetên tozbarînê de nêzîkê 172 kesan serdana nexweşxaneyê kirine û karê pêdivî bo çareseriyê ji wan re hatiye kirin. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin bi sedema tozbarînê nêzîkî 35 welatiyan ji bajarokê Şeqlawa serdana nexweşxaneyê kirine. Li Nehya Kelar ji 20 welatî çûne nexweşxaneya bajar. Li Bajarê Silêmaniyê ku asta tozbarînê nizim bû tenê 10 kesan serdana nexweşxaneyê kirine. Di rojên tozbarînê de Nexweşxana Hewlêrê ji hemû rojên din qerebalixtir bû. Amûrên oksîjenê datînin ser devê piraniya nexweşan. Beşek ji wan jî maske didin ber devê xwe û tên nexweşxaneyê.

Doktorekî Nexweşxaneya Hewlêrê der barê mijarê de wiha got: "Bêhna mirov diçike. Ger mirov xwe neparêze qirika mirov tê girtin. Serê mirov diêşe. Av ji çavan tê xwar û jan tên sînga mirov. Piraniya wan kesên ku di dema tozbarînê de serdana nexweşxaneyê dikin, ew kes in yan nexweşiya wan a sîng û tengenefesiyê heye yan jî çigarekêş in." Rêvebirê Beşa Kargêrî yê Nexweşxaneya Hewlêrê jî ev agahî dan: "Welatiyên ku bi sedema tozbarînê serdana nexweşxaneyê kirine, di mesela çareseriyê de çi pêwîst be hatiye kirin û tu rewşeke metirsîdar nehatiye tomarkirin."

Der barê sedemên tozbarînê de Rêveberê Jîngeha Hewlêrê Mistefa Muradî jî wiha got: "Sedema tozbarînê bi dereca yekê, bilindbûna pileya germa û çolistanbûna zeviyê ye. Çêkirina avahî û ji nû ve avakirina bajaran bê li ber çavgirtina pêwerên zanistî bandora wê heye. Her wiha bikaranîna ava jêr zeviyê ji aliyê welatiyan ve, sedemeke din e ku zevî hişk dibe û nem tê de namîne." **HEWLÊR** *(rûdaw)*



# Tesîsên masiyan têk diçin

Li Kurdistanê ji ber krîza aborî û buhabûna xwarin û êmê sewalan tesîsa masiyan a li Colemêrgê têk çû.

Tesîsa masiyan a ku 20 sal berê ji aliyê welatiyê bi navê Kerem Çalli ve li Colemêrgê hatibû avakirin, ji ber krîza aborî û buhabûna êmê masiyan îflas kir. Xwediyê tesîsa masiyan Kerem Çalli, di destpêka avakirina tesîsê de 10 karker dixebitandin, lê niha ji ber krîza aborî li ber sînorê girtinê ye. Çalli, xwest rayedar çareseriyekê peyda bikin. Çalli, der barê rewşa tesîsa masiyan de diyar kir ku beriya êm û xwarina masiyan buha bibe karê wan baş bû lê piştî ku xwarina masiyan buha bû êdî karê wan xera bû. Çalli wiha got: "Dema rewş baş bû me masî heta navçeyên Colemêrgê dişandin. Lê buhayê xwarina masiyan ji 2 TL'yî derket 4 TL'yî. Ji ber ku xwarina masiyan ji Enqere, Edene û Îzmîr û bajarên rojava ji me re tên em heqê kargoyê jî didin û lêçûna me pir zêde dibe."


**Tesîs biçûk kir**

Xwediyê tesîsa masiyan Çalli, anî ziman ku ji ber lêçûna xwedîkirin û hilberîna masiyan pir zêde dibe tesîsa masiyan biçûk kiriye.

Çalli wiha axivî: "Ji ber qeyrana aborî me tesîs biçûk kir û hejmara masiyan kêm kir. Niha em tenê ji bo lokantaya xwe masiyan xwedî dikin. Ger ku wisa dom bike ez neçar im ku karkeran ji kar derxim. Reyedaran mirovên herêmê bi qedera wî ve rû bi rû hiştiye û destê alîkariyê ji herêmê kişandiye" **COLEMÊRG**

# Li Duhokê şikeftek hate dîtin

Li Amêdiyeya bi ser Duhokê şikefteke dîrokî ya aydî dema Mîtaniyan hate dîtin. Li gorî daxuyaniyê Midûriyeta Arkeolojiyê ya Duhokê li nêzî Amêdiyeyê ev şikefta dîrokî hatiye dîtin. Di şikeftê de hestiyên mirovan jî derketiye. Rayedarên Midûriyeta Arkeolojiyê ya Duhokê diyar kirin ku di vê şikeftê de mirov jiyan e. Her wiha lêkolînên der barê şikeftê de jî dê bidomin. **DUHOK**


ARŞÎV

# Kevneşopiya hezar salan ‘Serê Gulanê’

Li gorî hin rîwayetan Serê Gulanê roja serkeftina Merwaniyan e, li gorî yeke din piştî hişkesaliyê farqîniyan dua kirine û bi barîna baranê bereket hatiye, li gorî hin rîwayetan jî Serê Gulanê bûkek e

**M. EMÎN SANCAR** AMED / ANF

Li navçeya Farqîna Amedê ev hezar sal in bênavber Cejna Serê Gulanê tê pîrozkirin. Farqînî vê rojê weke hatina biharê pîroz dikin. Farqînî roja serê sibehê heta êvarê bi xwezayê re derbas dikin. Di şahiyên Serê Gulanê de bi hezaran kes derdikevin derveyî navçeyê û pîrobahiyê li dar dixin.

Farqînî roja Serê Gulanê ji 7 salî heta 70 salî serê sibehê radibin û berê xwe didin park, baxçe, cihên dîrokî û çiyayê Albatê. Ji bo vê rojê li malan xwarinên taybet tên çêkirin. Wê rojê tu kes li malên xwe namîne. Roja xwe li derve derbas dikin. Sifreyên mezin tên vekirin û her kes hev du ji bo xwarinê gazî dike. Bi hev re xwarin tê xwarin û qala rojên borî û bîranînan tê kirin.

Farqînî ji bo seyranê diçin Malabadî, Kaniya Navîn ango parka Şaredariyê, Binê Sextê, Mînara Qot, Bêzwan, Zêwetirk, Şikeftên Hasûnî û Qulfayê. Ev der her sal serê sibehê tijî dibin. Hêlekan tên vekirin. Li ser agirê daran çay û xwarin tên çêkirin. Piştî ku xwarin tê xwarin stran tên gotin bi def û zirneyê govend tê girêdan. Kesên ku li derveyî navçeyê dijîn jî wê rojê ji bo betlaneyê tên Farqînê. Piştî pîrozbahiyan di saetên dereng de her kes êdî vedigere mala xwe.

**1’ê Gulana kurdan**

Dîroka cejna Serê Gulanê heta Merwaniyan diçe. Farqîna ku wê demê bûye paytexta Merwaniyan ev kevneşopiya xwe heta îro domandiye. Bi hezaran kesên ku li navenda Farqînê an jî gund, navçe û bajarên derdorê dijîn vê kevneşopiyê her sal bi awayekî rêkûpêk pîroz dikin. Kesên ku ji Farqînê koç kirine bi malbatên xwe re wê rojê tên Farqînê û beşdarî pîrozbahiyan dibin.

Li gorî rîwayetekê Serê Gulanê roja serkeftina dewleta Merwanî ye. Kesên ku li herêmên çolter dijîn ji bo pîrozkirina vê serkeftinê berê xwe dibin çiyan. Lê li aliyê din der barê kevneşopiya Serê Gulanê de çîrok û efsaneyên cur bi cur tên gotin. Li gorî salnameya Rûmî cejna kurdan a 1’ê Gulanê, 14’ê gulanê ye. Hemû farqînî wê rojê weke cejn pîroz dikin û rojeke weke cejnê û şahiyê derbas dikin.

Li gorî rîwayeteke din jî demekê li Farqînê baran nebariye. Ji ber vê yekê jî hemû farqînî derketine duaya baranê. Duayên wan hatine qebûlkirin. Piştî ku baran bariye axa Farqînê dîsa pir bi bereket bûye. Ji wê rojê wir de li Farqînê Serê Gulanê tê pîrozkirin.

Weke vê rîwayetê der barê Serê Gulanê de gelek çîrok tên vegotin. Yek ji wan jî wisa ye: Li gorî vê rîwayetê Serê Gulanê weke “Bûk” tê binavkirin û rîwayeta herî balkêş e. Li gorî vê rîwayetê Serê Gulanê bûkeke pir xweşik bûye û bûkeke din jî qebûl nekiriye. Ji dawetek weke bûk birina li ser bûkeke din dihat fêmkirin wê rojê li Farqînê dawet nedihat kirin. Ji ber ku weke guneh hatiye dîtin.



# Pirsgirêkên wan bi dawî nabin

Li Kadîfekaleya Îzmîrê ku herî zêde kurdên koçber dijîn pirsgirêka ragihandinê didome. Otobus pir kêm diçin û piştî saet 18:00’an jî bi hinceta ewlehiyê otobus naçin. Ji ber vê yekê welatî mexdûr dibin.

Pirsgirêkên şêniyên Kadîfekaleyê bi dawî nabin. Kadifekale ev demek e, di çarçoveya projeya veguherandina bajaran de tê xwestin ku bê valakirin. Lê li vir bi salan e pirsgirêka ragihandinê heye. Otobusên Şaredariya Mezin a Îzmîrê pir kêm diçin vir. Ji Konakê piştî saet 18:00’an jî bi hinceta ku otobus tên şewitandin û ewlehî nîn e otobûs naçin. Ji ber vê yekê jî kesên ku li vir dijîn tên mexdûrkirin. Bi taybetî jî kal û pîr, zarok û jin mexdûr dibin û ewlehiya wan dikeve xetereyê. Şêniyên Kadîfelakayê diyar kirin ku divê emniyet ewlehiyê pêk bîne û şaredarî jî dev ji vê pêkanînê berde. Jina bi navê Hediye Îlhan diyar kir ku bi salan e şaredarî vê pêkanînê didomîne û cudakariyê dike. Îlhan wiha got: “Yên ku dixwazin malên me li ser me hilweşînin jiyanê jî dixwazin ji bo me bikin dojeh. Dema ku em êvarê diçin malê em nizanin dê çi be serê me. Her tim bi tirs em xwe davêjin malên xwe.” Mavîş Akkurtê jî xwest ku şaredarî dev ji vê pêkanînê berde. **ÎZMÎR**

# Ji bo bîranîna Dag û Karaoglan turnuva



Navenda Çanda Ciwanan a Rojava ya Enqereyê, dest bi 4'emîn turnuvaya futbolê kir. Turnuvaya îsal dê ji bo bîranîna Mustafa Dag û Mahsum Karaoglan ku di 4'ê nîsanê de di bûyerên meşa Amarayê de jiyana xwe ji dest dabûn bê lidarxistin.

Turnuvayê, li Kampusa Cebecî ya Zanîgeha Enqereyê bi rêzgirtina ji bo kesên di têkoşîna azadî û aştiyê de jiyana xwe ji dest dane dest pê kir.

Hemû taximên futbolê yên ji aliyê xwendekarên zanîngehên li Enqereyê û ciwanên li taxan ve hatine avakirin beşdarî turnuvaya bi navê "Turnuvaya aştî û biratiyê ya Amara" dibin. Di dawiya turnuvayê ku wê 12 taxim beşdar bibin û di 19'ê gulanê roja sêşemê bi dawî bibe de, dê kupaya "Aştî û Biratiyê ya Amara" bidin taxima dê bibe yekem. Daximên 2'emîn û 3'yemîn jî dê bên xelatkirin. **ENQERE**